Serpêhatî

# BERXÊN ME

Husên Engîzek

**Berxên Me**

**Serpêhatî**

**Husên Engîzek**

**Çapa Yekemîn 2010**

**Çapa Duyemîn: Weşanxana Şilêr**

**Qamişlo 2017**

**Mîzanpaj û Bergê Pirtûkê:**

**Rêvan Mehmûd**

**weshanashiler@gmail.com**

**weje.vejin@gmail.com**

# PÊŞGOTİN

Ev pirtûk ji serpêhatîyên hin partîzanên PKKê li hemberî faşîzma Duwazdehê Îlonê ya sala 1980 pêkhatîye vedibêje…

Partîzanên PKKê di şert û mercên pir giran de, li hemberî faşîzma Duwazdehê Îlonê çawa li ber xwe dane, gelê me ewana çawa wek parçek ji canê xwe dîtine û parastine vedibêje…

Ev pirtûk, partîzanên PKKê wexta ku şoreşa vejînê hîna di dema xwe ya şitildayînê vedibêje… Ev dem demeke wisa bû ku; dewleta faşîşt a Tirk a dagirker dixwest serwerîya tirsê li Kurdistanê ava bike…Ev dem demeke wisa bû ku; dostanî, welatparêzî û îxaneta kor ku li hemberî her şaneya civakê dihate jîyîn…

Di demeke wisa de rêwîtîya partîzana a ku ber bi azadîyê vedibêje…

Rêwîtîyek ku, bûye çavkanîyên hevîyên rojên azad ku bi germayîyên tîrêjên roja me mezin û geş dibin…

# DÎYARÎ

*Ji bo partîzanên PKK û gelê me yê ku li hemberî faşîzma Duwazdehê Îlone ku diran bi diran li ber xwe dane...*

# Berxên me

Eger ku siya benê sêdarê li ser serê mirov biheje; dinya li ser serê mirov teng dibe. Wek dendika kizvanê lê tê... Mirov çiqas xwînsar jî be dinya li pêş çavên mirov pir biçûk dibe.

Siya benê sêdarê, li ser serê min. Ez ji bajarê ku ev çar sal in, lê dijiyam derketim. Bajarê min ê xweş, bajarê min ê ku ji pêsîra Çiyayê Ahirê ber bi deştê ve belav dibe ez derketim.

Di dilê min de tirs û xofa darvekirinê. Di mejiyê min de jî hizr û gumanên cur bi cur hebûn. Hizrên wisa: Ma gelo dijmin wê min bigire an jî na... Eger dagirkerên faşîst min bigirin, helwesta min wê çawa be; ez ê karibim gel, tevger û hevalan temsîl bikim an jî na... Mijara herî girîng, ez ê karibim şehîdên doza me temsîl bikim an jî na. Bi rûyekî spî û serbilindî ez ê hevalên xwe yên pakrewan temsîl bikim an jî na...

Ez di mejiyê xwe de van nîqaşan dikim. Lê, bîryara min a dawî rûmeta gel, tevger û ya xwe parastin bû... Di rêya hevalên me de meş bîryara min a dawî bû... Hin hizrên din, ên ku di mejiyê min de, wisa bûn: Careke

din, ez ê bajarê xwe yê şêrîn, bajarê min ê ku hewaya wê bi kêrî xwezayê, mirovan û ajalan tê; bajarê min ê ku ava wê sar, hewaya wê hênik, bajarê min ê ku di pêsîra Çiyayê Ahirê de hatiye avakirin, ez ê bibînim an jî na...

Ez bi van hest û hizran, bi lez ber bi geraja otobusê meşiyam. Eger ez bi lez nemeşiyabûma, min ê otobus birevanda. Diviyabû, ez li benda otobusa duwemîn bimam. Wê wextê min dizanibû bê wê çi bihata serê min. Ji sedî sed ez ê bihatama girtin. Ez ji vê bawer bûm. Lê bextê min hebû ez, nehatim girtin.

Di otobusê de, kursiya dawî vala bû. Ez li ser wê kursiyê rûnîştim. Otobus bi rê ket. Di derketina bajêr de her derek mişt asker û polês bû. Hemû wesayîtên ku ji bajêr derdiketin didan rawestandin nasnameyên rêwiyan ji wan pirs dikirin.

Wesayîta ku ez lê siwar bibûm, leşker û polêsan yek bi yek nasname ji rewiyan dipirsîn. Lê ku dor hat pirsa nasnameya min, polês û leşker wê kêliyê ji otobusê peya bûn. Ji min tu şik û guman nekirin. Bedlê min û sakoyê min pir giranbuha bûn. Li min jî hatibûn. Ez rûzarokî bûm. Ji ber wê yekê, ti guman ji min nekirin, leşker û polêsan...

Otobusa ku ez tê de; piştî lêgerîn û pirsîna nasnameyan, bi rê ket. Ez bê qeda û bela gihîştim cem heval û hogirên xwe. Li mala me ya komînê hemû hevalan ez, li ser piyan, li ber derî pêşwazî kirim. Me hemûyan destên hev guvaşt, ji bilî yek hevalî ...

Piştî kêliyekê ew hevalê ku xatirê min ne pirsî derbasî mezelekî dîtir ê malê bû. Hevalekî gote min: “ew heval li hêviya te ye.” Min ji wî hevalê ku bi xêrhatina min nekir û mirûzê wî tirş, tiştek fehm nekir. Ez dîsa jî rabûm çûm cem wî hevalî...

Ez rabûm, bi şewazekî bê dil çûm cem hevalê ku gazî min kiribû... Ew hevalê, xêrhatina min nekir, ew ê ku mirûzê wî tirş, devê xwe vekir; nêzî saet û nîvekê rexne li min kirin. Ez ji helwesta wî hevalî pir bêjar bûm, ez di hundirê xwe de teqiyam. Lê, min tu bersiv nedanê... Ji axaftinên wî ez tegîhiştim ku ev heval berpirsiyarê me ye.

Min, tenê daxwazeke xwe anî ziman... Beriya ku, ez daxwaza xwe ji wî hevalî re bînim ziman jî, ez pir hizirîm. Min wêrekiya xwe berhev kir û min daxwaza xwe ji berpirsiyarê me re got: “heval ez dikarim biçim filan bajarokî?..”

- Baş e heval, tu dikarî biçî wî bajarokî; hevalê xwe bibîne bi lez jî bizîvire herêma ku tu lê peywirdar e...

Min xatirê xwe ji hevalên xwe xwest û min berê xwe da bajarokê ku ez biçimê.

Helwesta berpirsiyarê me, helwesta wî ya sosret her di mejî min de bû. Mirûzê wî yê tirş jî, qet li pêş çavên min nediçû. Bi wî awayî ez, li otobusê siwar bûm. Di rê de min tiştek nedihizirî, min her tiştek ji bîr kiribû, ji ber helwesta berpirsiyarê me ya neyînî. Benê kindir ku li ser sere min dihejiya; benê kindir, ku her di bira min de bû jî, min ji bîr kiribû.

Şiklê berpirsiyarê me dişibiya şoforên kamyonan. Yekî zik meşk, bejna wî kin, pêşiya serê wî rût ango nîv keçel bû. Şikle wî, şiklê beradeyan bû. Min tirs û xofa darvekirinê ji bîr kiribû, ji cem hevalan heya gerajê, ji ber helwesta berpirsiyarê me... Piştî ku ez li otobusê siwar bûm jî, min helwesta berpirsiyarê me ji bîr nekiribû. Min siya benê sêdarê ku li ser sere min dihejiya jî, ji bîr kiribû. Lê helwesta berpirsiyare me, min ji bîr nekiribû...Helwesta wî, ez matmayî hiştibûm. Heya ku sê cenderme û başçawîşekî pispor otobusa me dane sekinandin.

Wexta ku leşkeran otobusa me dane sekinandin, ez pir tirsiyam. Heya ku leşker ji wesayîtê peya bûn, kut kuta dile min bû. Min di dilê xwe de ji xwe re got; dile min wê ji cihê xwe derkeve, dilê min wê biteqe, hindik mabû bêhna min biçike... Min di dilê xwe de got: "Bi Xatirê we hevalno, hogirno, Kurdistan, dinya, silav li we şehîdno... Lê, ya di dilê min de nehate serê min... Leşkeran çavên xwe li nava otobusê gerandin, paşê başçawîş ji şofêr re got: "Tu kursiyên vala nînin, me dixwest ku heya gundê li pêşiya me, li wesayîtê siwar bibin, lê xem neke, em ê li wesayîteke din siwar bibin, ji te re oxir be..."

Wexta ku ez li gotinên başçawîş gulêbûm, min bêhneke kûr da û stand, tirsa di dilê min de nehat serê min, bextê min lê dabû...

Ez bê bela gîhiştim cem hevalê xwe. Wexta ku hevalê min, ez dîtim matmayî bû... Piştî kêliyekê, ez hembêz kirim û xêrhatina min kir. Gote min: "Min bawer nedikir ku em ê hevdu bibînin."

- Piştî vê carê pêkan e, ku em hevdu nebînin. Ji ber vê yekê, ez hatim cara dawî te bibînim.

- Ser seran, li ser çavan re hatî.

- Sax bî...

Ez tenê şevekê li cem hevalê xwe mam. Wê şevê ez û wî li, kêleka Behraspî geriyan. Li ber bayekî hênik, li ber bayê bahorê... Me xem û xeyalên xwe ji hevdu re vegotin. Piştî saetekê an jî saet û nîvekê, em zîvirîn mala hevalê xwe.

Heya destê sibê em her du jî di nava nivînan de gevizîn. Xewa me her duyan jî wê şewê qet nehat. Hîna ji bo hilatina rojê nîv saet an jî saetek hebû ku em ji nav nivînan derketin. Me nivînên xwe rakirin. Me taştêya xwe bi zeytûn penîr kir. Em ber bi geraja otobusê bi rê ketin. Li gerajê me, xatir ji hevdu xwest bi xemgînî.. Wek gera me ya li kêleka behrê, wek li malê bi şev. Em qet bi hev re naxivîn...

Heya ku, otobûs bi rê ket hevalê min li wê derê sekinî. Wexta ku, otobus bi rê ket bê dil û bi şêwazekî xemgîn me destê xwe li hevdu hejand.

Wexta ku otobus bi rê ket, li gel çend bajarok û gundan min hin xem, tirs û xofên xwe jî li paş xwe hiştin... Wek siya benê sêdarê... Edî kêm caran darvekirin, dihat bîra min. Min hin hevalên xwe jî li paş xwe hiştin, min serpêhatiyên wan li gel xwe digerandin.

Lê, min xeyal û hêviyên xwe tu caran li paş xwe nedihiştin. Min ev her li gel xwe digerandin.

Di rê de ez pir hizirîm; ji bo çi mirov wexta ku ji yeki pir hez bike demek dirêj, wî nebîne, dem ku bi dest ket; eger mirov wî dibîne jî bo çi ker û lal dibe?... Li qonaxa dawiyê ku ez peya bûm, min bersiva vê pirsê dît; mirov, eger ku her tiştekî hevdu bizanibe, mirov bizanibe ku di dilê hevalê mirov de çi heye wê wextê bi hevdu re axaftin pêwîst nake. Wek can û cananan...

Ez bi hemû xem, xeyal û hevîyên xwe li gerajê ji otobusê peya bûm. Min çavên xwe li derdora xwe li mirovan gerandin, min mirovek ku berpirsiyarê me ji min re salix kiribû dît...

Berpirsiyarê me yê wek şofêrê kamyonan, ji min re gotibû; hevalekî ku, porê wî kej, yekî li ser xwe, rûyên wî çil, wê te li gerajê pêşwazî bike. Wexta ku, min çavên xwe li ser mirovan gerandin, min mirovekî wisa dît. Ez ber bi wî ve meşiyam.

Min jê re got: “dem baş...”

Ez bersivandim. Wî jî ji min re got: “dem baş…”

Ji xwe gotina dembaş paroleya me bû.

Hevalê ku ez pêşwazî kirim, em birin xwaringehekê. Hevalê min deriyê xwaringehê vekir, kete xwaringehê, ez jî di dû hevalê xwe re ketim xwaringehê. Dengbêjekî strana Memê Alan digot:

De wel wel mem ê min

De wel wel wel

Mem ê Alan e

Zîn a Zêde ne

De wel wel

Mem ê min

Wexta ku ez strana Memê Alan guh lê bûm, min ji xwe bi dîtina hevalê xwe siya benê sêdarê yê ku her tim, li ser serê min dihejiya min ji bîr kiribû. Vê carê min hemû xemê xwe yên dîtir ji bîr kirin...

Min ji hevalê xwe, navê denbêjê ku strana Mem ê Alan dibêje pirsî, gote min Miçêyê Kahtayî ye...

Heya mala me ya komînê, em bi hevdu re meşiyan. Lê belê, qet em bi hevdu re naxivîn. Yekcaran hevalê min di bin çavan re mêze min dikir, lêva wî hedîka dikeniya...

Di meşê de her ez gavekê, an jî du gavan li dû hevalê xwe dimam gavên min dirêj bûn. Gavên hevalê min bi qandî gavên min ne dirêj bûn. Lê belê, hevalê min pir bi lez dimeşiya.

Di rê de carekê tenê hevalê min bi min re axivî : "heval em ê heya ku dinya tarî bibe li qahwexanê rûnin. Wexta ku dinya tarî bû jî em ê biçin mala me ya komînê."

- Heval, ji bo çi em vê gavê naçin? Çima wexta ku dinya tarî bû em ê biçin?...

- Ew mala ku em ê biçinê vê gavê, pêşiya wê tijî jin in. Jinên taxa me, vê gavê hemû li ber deriyê wê malê rûniştine. Li ber danê êvarê ew jin wê biçin malên xwe; wê wextê em ê bi hêsanî biçin mala komînê.

Hevalê min, li pêşiya min, ez li dû wî, em çûn li qunçika qehwexanê li maseya ku zilamekî bi tenê lê rûniştî, em her du li maseya wî rûnîştin.

Zilamê ku em li gel rûniştin. Li kêleka wî çoyek hebû. Çoyekî, ji darê maziyê hatibû çêkirin... Serê ço jî bi bizmarê nalên hespan bizmarkirî bû.

Zilamê ku em li maseya wî rûnîştin, bi serê xwe silava me wergirt. Bi dengekî bilind bang li xortekî ku li qehwexanê kar dikir. Got: "Xorto, xorto…"

Xort serê xwe lê zîvirand : “Kerem bike Efendî...”

- Bi lez sê çay û tewleyekê ji me re bîne ku ez dersa Ezîz bidimê...

Xort bi lez tewle anî. Ezîz û Efendî dest bi lîstika tewleyê kirin. Lîstika wan bi ken û henek bû. Min bi kefxweşî ew temaşe kirin. Car caran yekî mirûzê xwe tirş dikir, car caran jî yê dîtir. Ji hevdu re digotin:

- Tu hîleyan dikî.

Car caran jî yê dîtir digot:

- Tu hîleyan dikî, tu hîlebazî.

Lîstika tewleyê bi têkçûna Ezîz, bi serketina Efendî bi dawî bû.

Di gemika êvarê de em, ji cem Efendî rabûn. Ez li dû Ezîz, heya mala me ya komînê em çûn. Ezîz ji bêrîka xwe mifte derxist, deriyê malê yê hewşê vekir. Em ketin hewşê, hevalek bi me hesiya deriyê malê vekir, ber bi me ve hat xêrhatina me kir. Hevalekî bilind li ser xwe çelenk...

*****

Heval Ezîz li min nêrî, li ber xwe nêrî, dîsa li min nêrî, ez tavilê têgîhiştim ku heval Ezîz ji min dixwaze ku pirsekê bike. Lê belê, min qet dengê xwe nekir. Heval Ezîz, dev bi ken gote min:

- Heval, ez ê pirsekê ji te bikim, tu dilê xwe li min negirî, hêrs nebî?

- Ji bo çi, ez dilê xwe ji te bigirim, ji ber pirsa ku tu ji min bikî ?

- Heval beriya ku, ez te bibînim min te di mejiyê xwe de wek dêwekî salix dikir.

Min, bi şewazekî asayî, heval Ezîz bersivand:

- Belê, heval Ezîz te di aqlê xwe de ez wek dêwekî salix dikirim. Lê belê, te dît ku, ez pir jar im. Eger, yek pif li min bike ez ê bikevim xwarê.

- Rast e heval, tu ew qas jar e ku mirov pif li te bike tu yê bikevî...

- Wê wextê, em navê te bikin Zirav…

- Ez, ji bo navê ku te li min kir pir kêfxweş bûm. Tu sax bî...

- Heval Zirav, em bi roj ji mal derdikevin diçin ser karê xwe, bi şev jî em têne malê. Ji ber vê yekê hin rojan, tu û Efendî bi hevdu re derkevin derve bigerin. Hem ji bo bêhnvedanê, hem jî ji bo naskirina derdorê...

- Baş e,heval Ezîz...

Beriya ku jinên cîranên me, li ber deriyê hewşa me berhev bibin, dest bi galgalê bikin, ez ji malê derketim. Ez çûm qehwexana ku Efendî lê. Efendî di quncikek qehwexanê de, bi tena serê xwe rûnîştîbû. Çoyê wî yê serî bizmarkirî, ji darê maziyê jî li kêleka wî bû, ço spartibû dîwêr.

Ez kêliyekê, li kêleka Efendî rûnîştim, me li hal û wextê hevdu pirs. Efendî gote min:

- Tu yê çi vexwî?

Min spasî li Efendî kir. Mİn gotê:

- Min, vê sibê taştê xwar.

Ez, ji vê yekê sosret mam!...

- Ma qey li mala me, nan û pêxwarin hebû ku te taştê xwariye?..

- Belê, Efendî min li malê taştê xwar...

- Nan kê anîbû, pêxwarin kê anîbû?...

- Nan, heval Bilind anîbû; pêxwarin jî cîraneke me anîbû.

- Belê, heval Efendî em rabin...

Ez û Efendî, em ji qahwexanê derketin. Me berê xwe da cihe ku heya, danê êvarê em, lê rawestin.

Nêzî çil an ji pencî xulekan em meşiyan; em gihiştin rawestgeha xwe ya rojê.

Efendî pir bi lez dimeşiya. Ez sêçar gavan li dû wî dimam. Efendî her sêçar gavan şûnde li paş xwe li mim dinêrî, car caran jî digot:

- Heval pêht bimeşe...

- Bi hemû heza xwe, ez dimeşim heval Efendî. Lê dîsa jî ez li paş te dimînim.

- Xeman nexwe, tu yê hînî meşa bibî. Ez bawer dikim.

- Bi îzna xwedê ...

Em gîhiştin rawestgeha xwe. Efendî li bin darekê rûnîşt. Piştî kêliyekê ez jî gîhiştim cem Efendî. Lê belê, min xwe avêt erdê...

Efendî bi min keniya, gote min:

- Heval tu pir sistî. Di vê rêya nêz de, tu nikarî bimeşî. Li çiyayên bilind, ew çiyayên ku lûtkêyên wan digîhije ezmanan, tê çawa bimeşî, wele heval tu yê pêrpêrîşan bibe.

Ez, ji gotinên Efendî, pêrpêrîşan bûm. Lê min, ev yek eşkere nekir.

- Rast e. Heval Efendî, ez dizanim ku ez ê di meşê de pir zor û zehmetiyan bikşînim, lê ez ji xwe bawer dikim ku ez ê, hînî jiyana çol û çiyan bibim; hînî meşa çol û çiyan bibim.

Rawestgeha me pêsîra çiyayekî bû. Bandora xwe li ser bajêr dikir. Bajêr di bin piyê me de dima. Li rawestgeha me bayekî hênik dihat. Bareşek hênik dihat.

Her hizr û bala min, li ser Efendî bû. Her bala min, li ser çoyê wî bû. Çoyê wî yê serî bizmarkirî, ço yê wî yê ji dara maziyê, pir bala min dikişand...

Lê min nediweriya ku ez vê yekê ji Efendî bipirsim. Min ev yek jî li Efendî eşkere nedikir. Lê carekî min hemû wêrekiya xwe berhev kir û min ev yek ji Efendî pirs kir:

- Heval Efendî, ez dixwazim pirsekê ji te bikim?..

- Kerem bike ,heval...

- Heval, ev çoyê te ku her tim di dest te de ye, ji bo çi serê wî bizmar kiriye?...

- Heval, çîroka wî çoyî dûr û dirêje. Mala me binemalek bû. Malek pir dewlemend bû. Piştî ku dê û bavê min mirin, mirovên min dest dirêjî mal û milkên

min kirin. Ji ber vê yekê min, hem li wan dida, hem jî min zirar dida mal û milkên wan. Ew xizmên min ên hîz û çavbirçî yên ku ji malê dinyayê têr nedibûn, bêbextî li min kirin, ku ez dînim. Ez îxbar kirim. Hin fermandarê leşkerî û hin komîser û polês bi bertîlê kirîn, li qereqolê êşkenceyên giran li min kirin, ji bo kuştinê gêf li min xwarin, paşê bi peran xizmên min, rapora dînîtiyê ji bo min wergirtin ...

Ji serboriyên Efendî, ez matmayî mam. Lê Efendî, bi hemû hêza xwe keniya. Kenê wî li hewayê deng veda. Kenê Efendî pir bala min kişand...

- Heval, ji bo çi tu bi dengekî bilind keniya?..

- Heval, piştî wê raporê navê min bû, Efendiyê Dîn. Min jî sond xwar û soz da xwe ku kengî fersenda axa û polêsan bi dest min ket, ez ê têra xwe li wan bidim. Ew roj, ev roj karê min ev yek e. Ji ber vê yekê ev çoyê min her di destê min de ye. Ev ço hevalekî min ê bê rih e...

Em rabûn, me berê xwe da bajêr. Bajêr di bin piyê me de dima. Me xwe serberjêr berda. Serberjêr ez qet li dû Efendî nedimam. Lê, di rêyên rast û hewrazan de her ez li paş Efendî dimam. Ji ber vê yekê qet di rêyan de em, bi hevdu re nediaxivîn. Tenê nêzî mala komînê, me ji hevdu xatir xwest. Min bi devikê xwe yê dayike na, bi devikekî dîtir ku ez, hîn bûme ji Efendî re got:

- Êvarbaş heval...

- Şev li ser serê te, xweş be....

*****

Beriya min, heval Ezîz û Bilind hatibûn mala me ya komînê. Di mezelê malê de rûnîştibûn. Min bi serê xwe li wan silav kir. Wan jî bi dengekî nizm silava min wergirtin. Ez rûnîştim. Heval Bilind dest bi axaftine kir:

- Heval Zirav, siberoj berpirsiyarê me yê vir, wê were cem me...

- Baş e, heval Bilind...

Dema em, li mal diman hem li ser karên xwe yê dûr û dirêj me nîqaş dikir; li gel vê yekê jî me nexşeyê rojan e niqaş dikirin. Weki din jî, her me klasîkên Marksîst û Lenînîst, şerên gelên bindest hem teorîyê wan hem jî pratîka wan dixwendin û me, li ser wan nîqaş dikir. Klasîkên wêjeyî tu caran di destên me de kêm nedibûn...

Siberoj berpirsiyarê me, beriya ku jinên taxê, li ber hewşa mala me li hev bicivin hate cem me.

Bi rojbaşê kete mezelê male. Pêşî ez, hembêz kirim. Paşê çû destê Bilind û Ezîz guvaştin.

- Heval, tu çawa yî, te pir zor û zehmetî kişand, te li Dîlokê kîjan heval dît?...

- Sax bî heval. Min li Dîlokê hin heval dîtin, hin jî nedîtin.

- Te hevalê li wê derê berpirsiyar jî dît, an na?...

- Belê, heval min dît. Ew hevalê ku pêşiya serê wî rût, zik meşk,ew ê wek şofêrên kamyonan...

- Bi te re çi axivî, çi ji te re got?...

- Gotineke baş ji devê wî derneket. Çiqas gotinên ne baş hene ji min re gotin. Wexta ku bi min re axivî, min di dilê xwe de got qey; hemû karên xerab li dijî tevgera Apoyî, min kirine, ji rexneyên wî ez gelekî xemgîn bûm. Matmayî bûm..

- Tiştek nabe, heval xeman nexwe...

- Ez çawa xeman nexwim heval, dinya li ser serê min teng bû, bi rexneyên wî yên ne di rê de.

Berpirsiyarê me yê, bi giştî yê herêmê, qet bersiv nedan gotinên min, tenê serê xwe hejand û keniya...

Berpirsiyarê me yê herêma min ê nû; dilnizm, zana û şermok xuyanî dikir.

Berpirsiyarê me, ji me her sêyan pirsî:

- Hûn pirtûkên klasîk, ên MarksîstLenînst , ên miletên bindest, dixwînin an jî na?

Heval Bilind, ev pirs bersivand:

- Em dixwînin,heval...

- Li hin herêman, hin hevalên me, berhemên pir giran dixwînin, wek Antî Duhrîng, wek Kapîtal... Ez bawer nakim ku hûn jî wisa bikin. Destpêkê mirov pirtûkên sivik bixwîne hîn çêtir e.

Beriya ku berpirsiyarê me, ji me xatir bixwaze got, hevalê Ezîz:

- Heval li ber deriyê hewşê binêre, jin hîna lê hene an jî na?...

Heval Ezîz ev yek pêk anî. Çû derve hate mal got berpirsiyarê me :

- Heval, li ber deriyê hewşa me qet jin nînin.

Berpirsiyarê me, wek ji me şerm bike, rabû ser piyan, xatirê xwe ji me xwest û li ser milê xwe yê çepê xwar xwar meşiya, heya ber deriyê hewşê, em jî li gel meşiyan me ew bi rêkir, li ber deriyê hewşê careke din ji me re got:

- Şevbaş û xebat xweş. Li ser milê xwe yê çepê xwar xwar meşiya û ji cem me çû...

*****

Me her sê hevalan pirtûk dixwendin. Mezelê me pir bê deng bû. Tenê dengê wesayîtên ku di rêya qîrê ku nêzî mala me de diçûn û dihatin, dihate guhê me.

Heval Bilind, pirtûka ku dixwend danî ser maseyê. Gote me. “ Hevalno, kêliyekê dev ji xwendinê berdin, pêdiviyeke me ya girîng heye, pêwîst e ku em vê pêdiviyê bi dest xwe bixin...”

Min dengê xwe nekir. Lê belê,heval Ezîz gote Bilind:

- Heval pêwîst e ku, em rojekê zûtir wê pêdiviyê bi dest bixin.

Min, ji meraqan ji Bilind pirsî:

- Heval Bilind, çi ye pêdiviya me?

- Mekîneyeke teksîrê, bi lez ji bo me pêwîst e.

- Hûn, li vê derê şahreza ne, wan deran hûn ji min çêtir dizanin, em dikarin li ku derê peyda bikin?...

- Em ê berê xwe bidin cergeyên dewletê û bi taybet jî li dibistanan kifşe bikin, helbet em ê mekîneyeke teksîrê peyda bikin.

*****

Rojên ku ez û Efendî, bi hevdu re bimînin û bigerin destpêkê, me li qehwexaneyê hevdu didît. Qehwexaneya ku min cara yekemîn, Efendî tê de dîtîbû. Piştre em diçûn rawestgeha xwe ya ku li ser tevahiya bajêr bi bandor...

Rojekê ez, beriya Efendî çûbûm qehwexaneyê. Hîna ez nû li ser kursî rûnîştîbûm ku hîna qehwexanevan ji min nepirsîbû ku tu yê çi vexwî. Di navbera hin mirovan de li qehwexanê nîqaşek dijwar çêbû. Piştî nîqaşê, li hev xistin, qehwexane jî bû qada şer... Ji bo ku ez, tu lêdanê nexwim, min xwe avêt mizgefta nêzîkî qehwexanê...Zilamê ku bi hev re şer dikirin, hinekan jî xwe avetin mizgeftê, hinekan jî da dû wan. Vê carê jî li mizgeftê li hev xistin. Mizgeft jî ji bo min nebû stare... Ji mizgeftê jî ez derketim. Li hemberî qehwexanê ez sekinîm. Ji dûr ve min Efendî dit. Çoyê xwe û bejna xwe dihejand ber bi qehwexaneyê ve dihat. Efendî hat ber deriyê qehwexaneyê. Di deriyê qehwexaneyê de Efendî, li hûndirê qehwexaneyê mêzekir û li paş xwe zîvirî, çavên wî li min ketin, berê xwe da min. Ber bi min ve meşiya... Bê silav dest bi pirsan kir:

- Heval Zirav, weke ku di qehwexanê de şer derketibe, qehwexane bûye qada şer?...

- Belê, hin karkeran destpêkê bi dijwarî nîqaş kirin, bi hev re dûjîn kirin, paşê bi bêr û tevran li hev xistin.

- Belê, ji ber tiştên qehwexanê; kursî, mase şikestine, cam jî xim û xiş bûne. Mirov dizane ku şerekî dijwar qewimiye.

- Belê, heval...

- Tu, li ku derê bû, wexta ku şer qewimî?...

- Wexta ku şer dest pê kir ez, li qehwexanê rûniştîbûm, ji bo ku ez, lêdane nexwim, çûme mizgeftê, lê hatin li mizgeftê jî li hev xistin.

- Eh! Em Kurd , wisa ne, heval... Wexta ku em ji hev hêrs dibin, çavên me tiştekî nabînin. Çavên wan mala Xwedê jî nabînin...

- Em, li vir nesekinin, em, biçin rawestgeha xwe, çêtir e...

- Rast e heval, em li vir nesekinin...

Efendî,wek her care yekdu gav li pêşiya min, ez li dû wî em, meşiyan, heya rawestgeha xwe...

Meş, qet ne xema Efendî bû. Lê meşê hetika min dibir, ez dikuştim... Wexta ku, ez qasekê dimeşiyam, ez pêrpêrîşan dibûm. Wexta ku, em digîhiştin qonaxa xwe ya dawî, min hema xwe davêt erdê. Deh an jî panzdeh

xulekan şûnde, bêhna min derdiket, piştî ku vedihesiyan me dest bi axaftine dikir:

- Heval Efendî, rewşa gel çawa ye?...

- Heval, destpêkê gelê vê herêmê, em nasnedikirin. Lê, piştî ku heval naskirin hedî hedî bûn dilsozên me. Em li vê herêmê hema hema diçin her derekê, kêm cihên ku em naçinê hene... Lê belê, hin cih hene ku em, li wan deran nikarin fikir û siyaseta xwe belav bikin, nikarin wan bi rêxistin bikin...

Car caran ez bi hin dostan re diçim hin gundan, xelkê hin gundan alîgirê me ne. Lê, xelkê hin gundan jî dûrî me disekinin...

- Şêniyên kîjan gundan dûrî me disekinin?...

- Şêniyên çiyayî dûrî me disekinin.

- Hemû şêniyên çiyayî dûrî me disekinin?

- Na, ji wan ên ku di bin bandora şêx de hene ew pir dûrî me disekinin. Ew şêx dijminekî me yê sondxwarî ye, giredayî dewletê ye.

- Ji wî şêxî re dibêjin: Şexê Menzîlê. Bi rêya murîdên xwe, xelkê wê herême, ji me dûr dike... Ji xelkê re dibêje: "Ev şoreşger, bi taybet jî Apoyî bê dîn û îman in..."

- Ma qey; heval nikarin bi xebatên xwe, xelkê wê derê qezenc bikin?...

- Xelkê wê derê jî wek min in...

- Çawa wek tene, heval Efendî?...

- Heval, li cem me, çîrokeke wiha vedibêjin: "Wexta komkujiya Ermeniyan, zilamekî Kurd, diçe mala yekî Ermenî, ji bo diziyê. Di male de sendoqeke giran, dide ser milê xwe û bi lez ji malê derdikeve. Qederekî dibeze, li nîvê hewrazekî sendoqê vedike, dibîne ku zilamek di sendoqekê de ye. Zilamê Kurd, yê ku sendoq heya nîvê hewraz bi zor û zehmetî bi pişta xwe aniye, matmayî dibe.... Ji zilamê ku di sindoqe de ye re dibêje:

- Tu efsûn î, tu ne zilam î, ne wisa ?...

Zilamê di sendoqê de dibêje:

- Na, wele, bîla, tîla, ez ne efsûn im. Ez mirov im. Ji tirsa canê xwe min xwe di sendoqê de veşart...

Zilamê Ermenî, dike nake, zilamê Kurd ê misilman jê bawer nake. Di dawiyê de mirovê Kurd, ji yê Ermenî bawer dike û ji wî re dibêje:

- Min ji te bawer kir, tu ne efsûn î. Lê belê, pêwîst e tu, dev ji dînê xwe berdî; were ser dînê min, eger ku tu bîbî misilman ez te nakujim.

Mirovê Ermenî ji mirovê Kurd re dibêje:

- Pêwîst e, ez çi bikim?...

- Kelîmeya şehadetê bîne?...

- Ez kelîmeya şehadetê nizanim. Tu, berî min bîne ziman, ez hîn bibim piştre ez ê, kelîmeya şehadetê bînim ziman; werim ser dîne te.

Zilamê Kurd:

- Ez, jî, kerekî wek te me. Ez, jî kelîmeya şehadetê nizanim.

*****

Em, bi şev di mala xwe ya komîne de bêdeng rûniştîbûn. Heval Ezîz, ev bêdengîya me ya aram bi dawî kir:

- Em bi ser karê xwe de biçin...

- Kîjan kar heval Ezîz?...

- Ew karê ku me, li ser nîqaş kiriye... Pêkanîna mekîneya teksîre....

- Baş e, heval Ezîz ez ji bo wî karî amede me...

- Ez, tu û Efendî; em, biçin mekîneya teksîrê bînin, hevalê Bilind jî karekî wî yê din heye... Ez bawer dikim ku dixwaze bi ser wî karî de biçe...

- Em ê efendî li ku bibînin, heval Ezîz?

- Heval Zirav, Efendî li ser rêya me ye. Li benda me disekine ...

Şev ewrahî bû. Lê, tava heyvê jî hebû. Car caran hêyvê xwe di bin ewran de vedişart. Car caran jî derdiket. Şev ronî dikir, me pêşiya xwe baş didît, em baş dimeşiyan. Lê belê, wexta ku hêyvê xwe dibin ewran de vedişart, me meşa xwe giran dikir ji bo ku em ji hev qut nebin...

Heval Ezîz gote min:

- Heval, tu li ser rê bimîne… Ez û Efendî, em ê biçin mekîneya teksîre bînin...

- Kijan rê heval?...

- Ew rêya bi qîr, dibistana ku em mekînaya teksîrê jê bigirin li başûre rê ye. Tu, li aliyê bakur bimîne... Ji bo parastina me... Binêre, ew dibistan e, tu deng li me bike em ê guh lê bibin…

Ezîz û Efendî, ji min cuda bûn. Bi ser karê xwe de çûn. Piştî çûyîna wan dusê deqîqan dengê şkestina caman hat guhê min, şing şinga caman ez, guh lê bûm...

Ezîz û Efendî, bi mekînaya teksîrê ve zîvirîn cem min. Lê belê, ji destê Ezîz ê çepê xwîn diherîkî...

Bi lez, em ji cihe çalakiyê dûr ketin. Di nav baxçeyekî spîndaran de em rûnîştin. Ji bo bêhn vedanê. Efendî, ji berîka xwe hinek tûtin derxist; danî ser destê Ezîz, ê birîndar û bi desmala xwe jî destê Ezîz, ê birîndar bi şewazekî şidandî girêda. Piştî girêdanê xwîna destê Ezîz sekinî. Bi sekinandina xwîna destê Ezîz, êdî Efendî dest bi tewzan kir:

- Ma dînekî wek min, yekî ku di serê wî de mix tune ye jî, wek te nake heval Ezîz...

- Baş e, heval min ê wê gavê çi bikira, min ê bi çi cama pencerê bişkenanda?...

- Heval, ma qey te darek berek nedît, min ev yek qebûle, lê çoyê min qet nehata bîra te, ez wî çoyî ji bo çi her gav li cem xwe digerînim?

Nêzî mala me ya komînê, ez ji her du hevalên xwe cuda bûm, ez çûm mala me ya komînê. Efendî û Ezîz jî bi mekîneya teksîrê çûn maleke din.

Di rê de, ez bi kotekî dimeşiyam. Çokên min sist dibûn. Çavên min tarî dibûn. Di kuçeyan de milên min, li dîwarên derdora kuçê diketin. Bi wî awayî, ez gîhiştim ber deriyê mala me ya komînê. Min kêliyekê li

derdora malê nêrî, piştre min hedîka derî vekir, ez ketim hewşê. Ez derbasî malê bûm. Di mezel de heval Bilind bi tenê rûniştîbû...

Bi vekirina min a derî, heval Bilind pê hesiya. Bi ketina min a hewşê û ketina malê nehesiyabû, Ji ber ku pirtûk dixwend. Piçekî ji ser kursiyê rabû, bi serê xwe ez silav kirim:

- Hal û wexta te çawa ye?...

- Baş e, heval...

- Hal baş e, an jî wext?...

- Hal pir ne baş e, lê wextê min pir baş borî...

- Rast e heval, halê te, baş xuyanî nake, lê ji ber karê ku hûn bi serketin e, pêkan e wextê te baş borî ye...

- Rast e heval...

- Tu nexweş xuyanî dikî, tu nexweşî, ne wisa ye?...

- Çokên min sist dibin, çavên min tarî dibin, hişê min diçe...

- Me, tu baş xwedî nekir. Xwarin û vexwarina me kem bû. Ji ber ve yekê, tu nêxweş ket. Em her roj bi ser karê xwe de diçûn, derfetên me ji bo xwarin û vexwarinê hebûn, lê tu li malê nîv têr nîv birçî dima....

- Xeman nexwe, heval Bilind wê derbas bibe....

Wexta ku em li bajêr di mala komînê diman, hevalê me yê berpirsiyar, car caran dihate cem me. Ji me re xwarina bi goşt, bi tam çêdikir. Roja ku berpirsiyarê me dihat cem me ji bo me cejn bû. Wekî din, em di mala komînê de her nîv têr nîv birçî diman...

- Biborîne heval, em te rêkin mala hevalekî me yê hêja. Nêzî hefteyekê, li mala wî bimîne, paşê em ê hev bibînin. Navê wî hevalê ku tu biçî li cem bimînî jî Evdirahman e...

- Ji ber ku rewşa te nebaş xuya dikir, pirsa ku ez ji te bikim, min nekir.

- Kerem bike,heval...

- We encam bidest xist, di wî karê ku hûn bi ser de çûnê?...

- Belê heval, me encam bidest xist, me ew mekîneya teksîrê anî.

- Her bijîn hûn, her serketin ji bo me ye...

- Wê wextê, ez xeberekê ku tu jê hem kêfxweş bibî hem jî nebî bidim te...

- Ez, bê sebr li benda xebera ku tu bidê min im.

- Ew berpirsiyarê me yê ku, li şûna rexneyan, heqeret li te kiribû, ew hatiye girtin. Bi lêdana kulma destpêke, her tiştê me daye, polêsan ...

- Bi kulmekê tenê li xwe mukir hatiye ne wisa?...

- Belê, heval Zirav...

- Ew ê, zik meşk, ser rût; ew ê, wek şofêrê kamyonan hatiye girtin?...

- Belê heval.

- Cihê heval Apo jî ji dijmin re gotiye.

- Navê wî çi bû?...

- Şahîn Donmez.

- Siberoj tu û Efendî biçin mala heval Evdirahman, çend

rojan li wê derê bimîne piştre em ê hev bibînin...

*****

Berya ku jinên taxê li ber deriyê hewşa me berhev bibin, Efendî hate cem me. Em ji mala me ya komînê derketin.

- Xelkê bajêr; karker, cotkar, dikandar diçûn ser karê xwe. Di hênkahiya sibê de meş xweş bû. Meş xweş bû lê, halê min ne baş bû. Efendî her henekên xwe bi min dikir:

- Heval Zirav, tu pê li wesayîtan nekî.

Ez, pêht nameşim ku ez, pê li wesayîtan bikim. Ez, bi kotekî xwe li ser piyan digirim.

- Tişt nîne heval. Eger, tu pê li wesayîtan bike jî em ê zirarê wan bidin.

Efendî, car caran destê min, car caran jî milê min digirt. Em , bi wî awayî dimeşiyan.

Nêzî xaniyekî du qat Efendî sekinî, bala xwe da min:

- Heval wî xaniyê hanê tu dibinî?...

- Belê, heval Efendî ew xaniyê ku derdorê wî merg û vekirî, boyaxa wî zer?...

- Belê, heval Zirav nêzî hewşa wî jî baxçeyên spîndaran, bî û bişengan heye.

- Nêzî mala Evdirahman e...

- Evdirahman kî ye heval?...

- Ma qey heval Bilind, di der heqê Evdirahman de agahî nedane te?...

- Heval Bilind ji min re got; tu yê çend rojan li mala wî bimînî. Lê, belê kî ye, çi kes e, mirovekî çawa ye?...

- Mirovek hêja, dilnizm û bi her tiştekî xwe ji bo gelê Kurd amede ye.

*****

Em gîhiştin mala Evdirahman. Evdirahman û jina wî, em li ber derî pêşwazî kirin:

- Hûn bi xêr hatin, hûn li ser seran; ser çavan re hatin, hal û wextên we çawa ye?...

Efendî, dora bersivdanê nedida min, her wî, bersiv dida. Efendî wê kêliyê wek wekilê min jî bû, Efendî:

- Sax bî, heval Evdirahman ez bi xwe baş im. Lê, hevalê min ne baş e...

- Derbasbûyî be heval...

- Sax bî heval ...

- Efendî, te heval bi me ne da nasîn?...

- Navê wî yê tevgerê Zirav e...

- Bi rastî jî Zirav e, gelek kêm kiriye. Bi nexweşiyê wisa lê hat, an jî ji berê de wisa jar bû?..

- Ez ji berê de wisa jar bûm.

- Careka din derbasbûyî be...

Min bi hejandina serê xwe û bi dengekî nizm, got:

- Sax bî...

- Ez, êdî xatirê xwe bixwazim...

- Xêr e Efendî, tu bi lez û bez xatirê xwe dixwazî, ma tu ji min acizî ?...

Li vê dinyayê kes ji te aciz nabe. Ji bilî yên sîxûr, yên xwe firoş. Wexta ku ez têm cem te behna min derdikeve. Karê min heye, ji ber vê yekê ez dixwazim xatirê xwe bixwazim. Zirav bi xema we ve. Baş lê binêrin, baş xwedî bikin, bila canê wî piçekî goşt bigire. Zikê wî bi pişta wî ve zelikî ye.

- Tu xeman nexwe ,Efendî...

Efendî, ji Evdirahman, jina Evdirahman û ji min xatirê xwe xwest, rabû ser piyan, li devê deriyê mezel li min zîvirî:

- Edî, em ê li mala nû, mala ku îro min nîşanî te kir, hevdu bibînin...

Evdirahman alîkarê şaredarê bajêr bû. Mirovekî pir hêja, zana û welatparêz bû. Serpêhatiyên wî pir bûn. Bi salan endamtiya PDK’ê kiribû.

Hîna zarokên wî çênebibûn. Jina wî jî her gav di xizmetê de bû. Tu nerehetiyên mirov nediman li gel wan. Mirov ji hemû derd û xeman dûr bû. Mirov, li cem wan her bi aram bû. Mirov li cem wan bi hizûr bû.

Evdirahman hefteyekê destûr wergirtibû, ji bo min... Min, gelek tişt ji Evdirahman wergirtin; ji dîroka giştî, ji dîroka Kurdistanê, ji xebatên nava gel, ji dîroka PDK'ê...

Ez, çand rojan li mala Evdirahman mam. Ji ali qedr û qiymet girtine, ku çi ji wan dihat dikirin. Tiştên ku li bajêr peyda dibûn, yên xwarin vexwarinê, yên giranbiha hemû tanîn pêşiya min. Ji xizmeta wan min şerm dikir.

Ez, çar rojan li mala Evdirahman mam. Piştî çar rojan min destûra xwe ji wan xwest:

- Bi destûra we ez, edî biçim mala me ya komînê...

- Tu yê bi ku de biçî heval Zirav, hina nexweşiya te derbas nebûye. Li gel me bimîne, piştî çend rojên dîtir biçe...

- Na. Heval Evdirahman, ez biçim çêtir e. Hin karên me hebûn, ez li gel hevalan bim, em ê bi hev re hin nexşeyên baştir çêbikin...

Her ku ez radibûm ser piyên xwe ku min xatirê xwe ji Evdirahman û jina wî dixwest; her duyan bi milên min digirtin, ez didam rûnîştin... Nêzî nîv saetê ev rewş dewam kir. Ez radibûm ser piyan wan her duyan bi milên min digirtin nedihêlan ku ez ji mala wan derkevim...

Piştî nîv saetê her du qanî bûn ku karê min heye. Destûra min dan. Her duyan bi hev re:

- Eger ku karê te nebûya me hîna çend rojên din tu bernedida...

- Eger ku min karê xwe xilas kir. Ez ê careke din werim serdana we...

- Em bawer nakin, wextê Apoyiyan vala hebe. Lê dîsa jî em li benda te ne...

Evdirahman û jina wî heya deriyê hewşê li gel min hatin:

- Oxira xêre be heval, careka din înşalah em ê hev bibînin...

- Înşalah heval Evdirahman....

Ez, ji mala Evdirahman derketim, ber bi mala me ya komînê ve sist sist û xwar xwar dimeşiyam. Hîna ez, nezî kîlometrekê ji mala Evdirahman dûr neketibûm

ku polêsekî ku taksiya xwe hêdî hêdî diajot; serê xwe di pencereya taksiyê re derxist û qederekê li min meyze kir. Polêsê ajokerê taksiyê, ji min nêzî nîv kîlometreyê dûr ket. Kete avahiyeke du qat û pir xweş...

Wexta ku ez, jî di ber wê avahiye re derbas bûm, dîsa wî polêsî serê xwe di çarçova pencereya avahiye re derxist nêzî deh xulekan li min nêrî...

Ez bi meşekê hêdî û giran gîhiştim, mala me ya komînê ya nû. Li malê çar heval hebûn, ji wan hevalan hina bi deng, hina jî bê deng bi serê xwe, xêrhatina min kirin.

- Sax bin, heval no...

- Em, êdî bûn pênc heval, êdî li vê malê em ê pênc heval bimînin, heval Zirav.

- Heval Ezîz, we hevalên nû bi min ne dan nasîn?...

- Navê kodê hevalê nû Hesen e...

- Edî em jî pir dibin, tu bi xêr hatî, nav refên Apoyiyan heval...

- Sax bî heval Zirav, êdî em jî zêde dibin.

- Evdirahman çawa bû?..

- Mirovên wisa li nava Kurdan kêm in...

- Mirov li gel yên wek Evdirahman aramiyê peyda dike...

- Rast e heval Ezîz, mirov li cem ên wek Evdirahman tenê aramiyê nastîne, gelek tiştan jî distîne,

- Wek çi?...

- Wek zanabûn, welatparezî, berxwedanvanî, dilnizmî...

- Mirovên wisa yê ku ji bo gelê xwe, ji bo welatê xwe, bi dil û can xebatê dikin kêm in.

- Durust e heval Ezîz...

- Te, bi hêsanî ev mal dît an na, heval Zirav?

- Ev mal, berê heval Efendî nîşanî min dabû, ji ber vê yekê min bi hêsanî dît.

Lê, wexta ku ez dihatim cem we vê male, polêsekî ez bi baldarî şopandim.

Heval Bilind, li ser vê agahiya min, bi hêrs û fikar:

- Çi polês! Heya ku wî ziqûmî, tu şopandî; mala me ya nû dît an jî na?...

- Heval Bilind, ez hişyar im. Ne pêkan e ku vê malê bibîne, ji ber ku min rêya xwe guhert. Ez ketim nav baxçeyê spîndaran, min li derdora xwe mêzand, piştre ez hatim vê malê.

- Baş e heval...

Wextê şîvê bû, heval Ezîz ji me hemûyan pirsî:

- Heval no! em ê çi bixwin?...

- Ez, bawer dikim ku heval Ezîz, êdî em ji xwarinê ve dewlemend in.

- Eh,rast e. Heval Zirav, êdî ji aliyê xwarinê ve derfetên me peyda bûn.

Me hemûyan bi hev re:

- Tu dizanî heval Ezîz; tu çi hazir dikî, bike...

- Wê wextê şîva me îşev, bila meqerna û hêk bin.

Wexta ku ez, li mala Evdirahman bûm. Evdirahman nasnameyeke hevalekî me yê mamosta dabû min, ji bo ku ez, yekcaran li bajêr pê bigerim. Min ev yek di dilê xwe de bir û anî ez vê yekê ji hevalan re bêjim an jî na, lê dawî min bîryar da ku ez, vê yekê ji hevalan re bêjim, bîryar dayîna min û ji hevalan re gotina min bû yek:

- Hevalno! Heval Evdirahman, nasnameyeke hevalekî mamoste da min, ez ê wêneyê lê bixim. Ji bo ku ez, car caran pê li bajêr serbest , bi dil rehetî, bê tirs bigerim.

- Nasnama kîjan mamosteyî ye?...

- Heval Bilind,Heval Evdirahman gote min ku nasnameya mamostayê dibistana seratayî ye; ji gundekî kolikê.

- Hate fehmkirin, em wî mamosteyî baş dinasin, mirovekî hêja ye...

- Baş e, heval Bilind....

Min wêneyên xwe xistin nav nasnameyê. Nasname, jî min xist paş derî, ber pencereyê.

Wê demê dengên wesayîtên leşkerî hatin ber guhên me. Bi dengê wesayîtan heval Bilind ji nişka ve çû ber deriyê xaniyê me yê başûr, bi dengekî bilind, hate ber deriyê bakur:

- Bi lez birevin leşkeran em dorpêç kirin.

- Me pêlavên xwe bi lez û bez pê kirin. Di deriyê xaniyê me yê bakur re bi lez û bez me baz da... Leşker bi me hesiyan û qîriyan:

- Bisekinin ûlen, em ê we bikujin.

Lê, guman hebû ku ew fîşekan li me bireşînin, me xwe avêt nav baxçeyên bî û spîndaran.

Wê gavê, pêlava min a piyê rastê, kete nev heriyê. Çiqas ku ez, lê geriyam jî min pêlava xwe peyda nekir.

Bilind, Ezîz û ez bêhnekê di nav baxçeyan de rûniştin. Em, li benda hevalê me yê ku nû tevlî me bibû sekinîn. Lê, ew nehat... Em ji nêçarî ji wê derê rabûn. Kêliyekê heya cihekî bi hev re em meşiyan, heval Bilind gote min:

- Heval, em ê ji vir ji hev qut bibin. Em ê li bajêr bimînin. Tu biçe gundê me, Efendî li wê mala ku tê zanîn e...

- Serketin ji bo we.

- Serketin ji bo te jî...

Ez ketim ser rê. Bê pêlav, ber bi gundê Ezîz... Li ser rêya min coyeke ave ya ji betonê derket pêşiya min. Min dusê gavan xwe şûnde vekişand; min xwe di ser coye re avêt; ji bo ku navrana şalê min teng bû, destê min ê rastê li kêleka coyê ket, wek destê min ê rastê di zenda min de bi kêrekê bê qelişandin êşiya...

Di navbera gundê heval Ezîz û bajêr de malek hebû, malbeteke welatparêz.... Ji bo ku ez pêlavekê peyda bikim, min berê xwe da wê malê...

Min, kêliyekê li derdora malê temaşe kir, dinya ker û lal bû. Tu kes li derdora malê tune bû. Ez hêdîka meşiyam min li deriyê malê xist. Zilamekî ji malê navê min pirsî. Ji bo ku ez ne nasê wan bûm, min got ez mêvanekî Xwedê me... Derî li min vekirin, ez bi silavê derbasî mezelê xanî bûm. Çavên min bi Efendî ketin. Bi dîtina Efendî, ez pir kêfxweş bûm...

Dîtina Efendî wek yekî kor, ji nişqa ve, çavên wî ronî bibin li min hat.

- Piştî kêliyekê, Efendî gote min:

- Eger ku te bêhna xwe berdabe, em rabin çêtir e.

- Çi bêhnvedan Efendî, ez ji ber êşa zendê destê xwe can dikişînim, pêlava lingê min a rastê jî di rê de di nav heriyê de ma.

- Em ji xwediyê male, pêlavekê ji bo te bixwazin, çend numare ne pêlava te?...

- Çil û yek...

Efendî, ji xwediyê malê, pêlavek xwest; zilam got, lingên min çil û pênc numare ne; ya xanima min jî sîh û neh numaren e..

Efendî berê xwe da min:

- Tu yê kîjan pêlavê têxî lingên xwe?...

- Heval Efendî, pêlava zilam li gor lingên min pir mezin e. Ya baş, ez pêlava jinê têxim lingên xwe.

Min pêlava jinê ya sîh û neh numare xist lingê xwe. Me ji xwediyê malê û xatûna malê xatirê xwe xwest. Me berê xwe da gundê heval Ezîz.

Lê belê, pêlava ku min xistibû lingên xwe, ji bo ku du numare ji lingê min biçûktir bû, pelavê lingê min guvaşt. Lingê min ê rastê bû weke kulmekê. Lê, ji ber êşa zenda destê min ê rastê, êşa lingê min ne xema min bû.

Efendî, cara yekemîn bû ku gavên xwe wek gavên min diavetin. Di vê meşê de Efendî, gavek ji min zêdetir neavet. Her serê dusê gavan Efendî, halê min dipirsî:

- Heval zenda destê te çawa ye?...

- Jana zenda destê min wek mirov bi kêrekê qelişandibe, janeke wisa ye...

- Em ê îşev li gundê, heval Ezîz bimînin, siberoj li ser rêya qîr gundek heye, li wî gundî cebirvanekî bi nav û deng heye; em ê biçin mala wî, bila li zenda destê te meyzekê.

- Ez nizanim, zenda destê min derizî ye, an jî ji cih derketiye.

- Ew cebirvan wê zanibe, ji cih derketiye, an jî derizî ye...

- Em, îşev li ku bimînin heval?...

- Heval Efendî, em di nav rezan de bimînin, çêtir e.

- Eger, tu wisa baştir dibînî, em li nav baxan bimînin, axa nav baxan ji axa dîtir nermtir e, ji bo raketinê jî ji axa dîtir xweştir e...

Hîna em negîhiştibûn kêleka gundê Ezîz, dengên wesayîtên leşkerî hate guhê me. Lê belê, beriya min Efendî, bi dengê wesayîtan hesiya. Efendî gote min:

- Heval, bi lez em xwe biavêjin nav rezan...

- Em bibezin heval?...

Bi gotina min a em bibezin; me xwe avet nava rezan.

Me bêhneke kûr da. Wexta ku em gîhiştin nav rezan... Me xwe di nava rezan de dirêj kir. Her çavên me li ser wesayîtên leşkerî, guhên me jî li ser dengên leşkeran bûn... Wexta ku dinya tarî bû jî guhên me her li ser dengên wesayîtên leşkerî bûn....

Bi şev qet dengê wesayîtên leşkerî nehat guhên me. Lê, ji guhê me jî şildim bildima leşkeran qet kêm nebû. Ji ber ku her dengên wan dihat guhên me; me dizanîbû ku gund dorpêç kirine...

Heya sibê; ez û Efendî, em her hişyar bûn. Qet xew bi çavên me neket... Siberoj leşkeran xwe ji gund vekişandin.

Efendî:

- Heval îro em qet neçin wî gundî, çi dibe, çi nabe... Em ji bo zenda destê te biçin wî gundê li ser rêya qîr...

- Xebarê te ye heval tu, çawa guncav dibînî bila wisa be. Lê, pêwîst e ku tu, pêlavekê ji bo min peyda bikî.

Ez di nava rezan de mam. Efendî çû ji gund, pêlavek ji min re anî û me berê xwe da gundê cebirvan...

Di rê de qet em naxivîn, ji bilî carekê... Efendî berê xwe da min:

- Çîpên te dihejin, tu çawa ket, destê te wisa lêhat?...

- Heval Efendî, navrana şalwarê min teng bû, ji ber vê yekê wisa lêhat... Wexta ku min xwe di ser coyê re avet, min dusê gavan şûnde xwe vekişand û min xwe di ser coyê re avet. Lê, dîsa jî destê min li kêleka coyê ket, ez jî ketim nava avê.

- Te gelek zor, zehmetî û êş kişand...

Di meşê de, Efendî gavek jî ji min zêdetir nedavêt bi awayî min ew bersivand:

- Rast e heval... Bi vî awayî em gîhiştin kêleka gundê Cebirvan... Lê, meydana nava gund bi şêniyan tijî bû. Şêniyên çend gundan nezî meydana gund diçûn malekê. Hin diketin wê malê, hin jî jê derdiketin, li meydana gund berhev dibûn.

Efendî, berê xwe da min:

- Li gorî min, hin bûyerên ne baş li wî gundî qewimîne. Em, ji hin kesan sedema vê hatin û çûyîne bipirsin...

- Gotin a te ye Efendî...

Em çûn ber deriyê malekê. Efendî, li derî da lê, kesî derî venekir. Efendî çend caran bi dengekî bilind got:

- Malê, malê, kes li mal nîne... Disa kesî deng neda... Efendî li pêşiya min, ez li dû wî em, ketin hundirê xanî. Me deriyê mezelekî vekir, pîrejinek di nav nivînan de raketîbû...

Efendî, çû ser serê pîrejinê, got:

- Metê, metê, çaxa te bi xêr... Efendî ev gotin çend caran dubare kir. Pîrejinê bi zorê got:

- Hûn bi xêr hatin...

Demek dirêj pîrejinê û Efendî ji hevdu fehm nekirin. Ji ber ku guhên pîrejinê giran bûn. Pîrejinê her berevajî Efendî dibersivand:

- Metê, ji bo çi şênî diçin, wê mala li kêleka meydana gund?...

- Berxên min, hûn bazirgan in?...

- Na metê, em heval in. Em Apoyî ne...

- Berxen min hûn ê, çi bikirin?...

- Metê, em tiştekî nakirin...

- Hîn ne wextê firotina tûtinê ye. Hîn zû ye...

- Metê, zenda hevalê min ji cih derketiye; an jî derizî ye em nizanin... Lê, heval ji ber êş û jana destê xwe debar nake, pir aciz e...

- Berxên min, li gundê me îro şîn e; li gundê me yekî cebirvan heye, kur û bûka wî îro di qezaya trafîke de jiyana xwe ji dest dan...

- Bila serê we sax be metê....

Axaftina Efendî û pîrejinê bi ketina xortekî ya mezel qut bû. Destpêke xêrhatina me kir xort, paşê Efendî, ji xort pirsî:

- Birazî, ev hevalê me destê wî ji cih derketiye; an jî zenda destê wî derizî ye, em nizanin. Ma em wî hevalî nikarin bibin cem cebirvan...

- Heval duh, kur û bûka wî cebirvanî jiyana xwe di qezaya trafîke de ji dest dan. Lê dîsa jî ez herim jê re bêjim, xweşmêreke, yekî welatparêz e, dibe ku were lêbinêre ...

- Sax bî birazî, te çawa zanî bû, em Apoyî ne?...

- Efendî, li herêma me her kes nas dike. Ji ber vê yekê min zanî bû ku hûn heval in.

Xort bi destûra me çû cebirvan bîne.

Efendî bi devkî, min bi serê xwe gote xort:

- Sax bî...

Dema ku xort ji malê derket, dapîra wî lihêf kişand ser serê xwe û raket.

Piştî nîv saetê cebirvan, zilamek û xort hatin cem me. Zilamê ku li gel cebirvan hatîbû kurê cebirvan bû. Cebirvan yekî kelew û li ser xwe, kurê cebirvan yekî jar bû...

Cebirvan piştî silavê, gote me :

- Hûn bi xêr hatin berxên min, li mala me şîn e. Em bi lez li destê hevalê ku cih derketiye binêrin...

- Bila serê we sax be apo...

- Rahme li dê û bavê te...

Wexta ku axaftina Efendî û cebirvan qediya. Min got:

- Ez im apo, yê ku destê wî derizî an jî ji cih derketî...

- Kerem bike were cem min...

Ez rabûm, çûm di navbera cebirvan û kurê wî de rûnîştim.

Cebirvan destê min danî ser rehnê xwe, bi tiliya xwe ya mezin zenda destê min mist da mist da, tiliya xwe bir û anî, bir û anî, serê xwe li kurê xwe zivirand:

- Ez bawer dikim ku ji cih derketiye. Ez dikarim têxim cih, tu milê berxê min bigire, ez têxim cih...

Cebirvan destê min girt, kurê wî jî milê min, ji nişka ve cebirvan destê min bi hemû heza xwe kişand,qirçîni bi zenda destê min ket.

Cebirvan gote min:

- Derbasbûyî be berxê min, zenda te kete şûna xwe..

- Sax bî, apo...

- Birazî, hûn dizanin di mala me de şîn e. Em rabin çêtir e...

- Em ê jî rabin apo, careke din bila serê we sax be.

- Rahme li dê û bavê te. Berxê min axaftina te, wek axaftina me ye. Tu ji herêma me ye, ne wisa?...

- Apo,rast e. Gotina te ye; ez jî ji cem we me. Navê min jî Efendî ye...

- Herin, berxên min herin....

Me berê xwe da, gundê Ezîz. Lê, piştî ku em ji gundê cebirvan derketin, deh panzdeh xulekan zenda destê min perçivî, perçivî, zenda min bi qandî çîpê min lêhat. Ji ber perçivînê...

Lê, ji bo ku zenda destê min sax nekir, ez qet ji cebirvan hêrs nebûm. Di dilê min de di derheqê cebirvan de tu tiştên xirab tune bûn. Ji ber ku kur û bûka wî di qezaya trafîke de jiyana xwe ji dest dabûn, dîsa jî mêvanên xwe yê ku ji bo sersaxiyê hatibûn, li mala xwe hiştibûn û ji bo min hatibû. Heta, wextê ku me xatirê xwe ji wî xwest, gotina wî ya ku bi me re kir:

- Herin, berxên min herin, bila we negirin, şehîd nekevin.

Her di guhê min de deng vedida. Ev gotin ku dihat bîra min, êş û jana destê xwe min ji bîr dikir.

Min di rê de berê xwe da Efendî:

- Heval, ez ji helwesta cebirvan pir kêfxweş û dilşad bûm. Ji ber ku mevanên xwe yên ku ji bo sersaxiyê hatibûn li malê hiştibûn; bi lez û bez hatibû cem me...

- Belê heval, ez jî pir bextewar bûm

- Çiqas zenda destê min sax nabe jî, ez ji wî zilamî bextewar im.

- Hestên min jî, bo wî zilamî wisa ne...

- Êş û jana destê min jî qet ne xama min e...

*****

Hêyv çardeh bû. Şewqa hêyvê şev wek rojê ronî dikir. Em, li benda Bilind û Ezîz bûn. Her du jî bi şev hatin cem me. Mirov ji bet û benzên wan fehm dikir ku bûyereke ne di rê de hatiye serê wan. Ji ber vê yekê, mirov dizanîbû ku tiştekî xirab qewimiye. Wê şewê, dinya jî ker û lal bû. Ezîz û Bilind ji dinyayê jî ker û laltir bûn. Devê her duyan jî kesî nedikarî bi kêrê veke. Her du pir xemgîn bûn. Lê, heval Ezîz ev bêdengî rakir:

- Hevalno! Duh bi şev wexta ku me, belavok belav dikirin, di navberê me û polêsan de şer derket. Di wî şerî de Heval Husên birîndar bû, paşê jî şehîd ket. Em ê îşev biçin bajêr; siberoj em ê termê heval bi merasîmeke girseyî rakin...

- Baş e heval, em hema rabin biçin...

Efendî li min hêrs bû:

- Heval, tu dibêjî em rabin biçin, rewşa destê te li pêş çavan e, tu yê bi wî halî çawa biçî û tevlî merasîmê bibî?...

- Xema nexwe heval, ez dikarim werim....

Ezîz, li zenda min nêrî:

- Heval, tu nikarî bi me re werî bajêr. Ez ê yekî gundî, îşev rêkim cem te. Siberoj ew gundê ku li jor gundê me, li wî gundî cebirvanek heye, biçin cem wî cebirvanî, bila zenda destê te bicerîbîne...

Min, bi serê xwe; gotinên heval Ezîz ,bê dil qebûl kirin...

Lê, wê şewê bêdengiya heval Bilind heya demekê her bala min dikişand.... Lê, piştî axaftina min û Ezîz wî jî bêdengiya xwe xira kir:

- Pêwîst e, em heyfa heval Husên hilînin, xwîna wî li erdê nehêlin. Siberoj pêwîst e, em heyfa wî hilînin...

- Îstixbarat û kifş, bila karê min be,heval Bilind...

- Îstixbarat û kifşa çi û ya kê?...

- Ew ê ku min, çavên wî bi lêdane kor kir, ew ê ku niha serokê faşiştên bajêr e...

- Buroya wan nêzî cihê merasîmê ye...

Mirovên nas jî yên nenas jî ji me re digotin: “Heval!” Ez û gundiyê ku heval Ezîz şandibû cem min, gundiyê ku em ê bi hevdu re, biçin cem cebirvanekî din, qet navê min nepirsî. Her ji min re digot: “heval...”

Heval Ezîz, bi şev, ê gundî şandibû cem min. Bi şev qet em bi hevdu re naxivîn. Wexta ku roj hilat; em, bi rê ketin. Hevalê min ê rêwîtiyê ew bêdengî xira kir:

- Heval, tu guh lê bû?...

- Çi heval, ez tiştekî guh lê nebûm....

- Heval Husên çawa şehîd ketiye?...

- Na, heval ez nizanim çawa şehîd ketiye. Hevalan jî ji min re negot...

Heval, wexta ku belavokan belav dikin, polês û faşîşt li gel hev, êrîşî hevalan dikin. Wê wextê heval Husên birîndar dibe, heval Bilind jî, heval Husên hildide pişta xwe, heya deriyê nexweşxanê dibe. Lê mixabin, wê şevê doktorê peywirdar yekî faşişt bûye, li birîna heval Husên nanêre, ji ber vê yekê, heval Husên şehîd dikeve....

- Min, ev yek nedizanîbû...

- Piştî ku heval Husên jiyana xwe ji dest dide, Heval Bilind; ji bo ku jiyana heval Husên xilas nekiriye, dixwaze ku xwe bikuje, fişekê dide ber çardehxurê, heval Ezîz bi zore çardehxurê ji dest digire...

Ez û hevalê xwe yê gundî gîhiştin gundê cebirvan. Lê, cebirvan em nevexwendin malê... Em li ber deriyê mala cebirvan, li ser erdê rûniştin...

Cebirvan, ji gundiyê li gel min re, bi dengekî bilind û bi hêrs:

- Zilam, here hêkekê bikire. Ji bo zenda destê hevalê xwe.

Hevalê min ê gundî awirên xwe, li cebirvan zîq kirin û bi hêrs:

- Bila, ez diçim hêkekê dikirim

Ji bo hêkê, çûyîn û hatina hevalê min bû yek. Li gel hevalê min jî çend zilamên gundî jî hebûn... Zilamên gund hemûyan, bi cebirvan re dijûnên giran kirin. Pişti çend xulekan piraniya xelkê gund li ber deriyê cebirvan berhev bûn. Zilamekî li ser xwe, cil û berxên wî law, simbêl sor jî hate ber deriyê mala cebirvan, bi ser cebirvan de çû, jê re dijûn kirin:

- Te, em rezîl û ruswa kirin, ma tu ne mirov î; tu ji hevalan re dibejî, herin hêkekê bikirin... Tu hevalan

dawetî mezelê mêvanan nakî, li ber derî dihêlî, yekmêrdiyeke, an jî doşekekê nadeynê erdê, balîfan nade paş wan, ji bo ku heval pala xwe bidinê...

Wexta ku, zilam bi ser cebirvan de çû, bi cebirvan re dijûn kirin; gundiyê ku li ber deriyê mala cebirvan kom bibûn, xwe ker û lal kirin.

Cebirvan, li hemberî gotinên zilam xwe mit kir. Bi zorê û bê dil got: “bila derbasî jor bibin...”

Zilamê ku xwe li cebirvan aciz kiribû jî bi me re derbasî jor bû. Keça cebirvan, yekmêrdiyek ji mezinê gund re danî. Ji me re jî doşekek danî. Keça cebirvan ji mezinê gund re got:

- Kerem bike Apê Hesen rûne...

- Sax bî, keça min....

- Apê Hesen, li bavê min biborîne, qusura wî efû bike.

- Ev berxên me ne. Hûn ê, qedr û qiymeta wan, ji min çêtir bigirin...

- Rast û durust e, Apê Hesen. Bila heval dilê xwe li me negirin...

- Xeman nexwe, careka din, bavê te tiştên wisa bike, ew dizane.

Cebirvan li keça xwe heytan:

- Teştê, sabûnê û ava germ bîne...

Li şûna keça cebirvan, wê carê jina wî tişt anîn. Beriya ku tiştên ku di dest xwe de deyne erdê, bi heyacan ji Apê Hesen re :

- Li wî biborîne carekê kêmasiyek kir...

- Tişt nîn e keça min...

Paşê jî, jinê xêr hatina me kir, teşt sabûn û ava germ danî pêşiya min...

Cebirvan jî hate pêşiya min, zenda destê min girt û xwe bi xwe re hêdîka got:

- Baş e...

Min jê pirs kir:

- Çi baş e apo?...Werma zendê daketiye, ev yek pir baş e...

Cebirvan zenda min, bi sabûn û ava germ mist da û mist da, ji min re:

- Ji cih derneketiye. Zenda te derizî ye, ez ê niha girêdim, namîne hefteyekê wê sax bibe...

- Sax bî Apo...

Cebirvan, spiya hêkê di paçekî spî da; paşê bi wî paçê spî, zenda min pêça. Çar textik jî danîn derdora zenda min û zenda min, jî bi paçekî qayîm; paçekî ku neqete gireda. Wexta ku girêdan qedand, gote min:

- Derbasbûyî be, birazî...

- Sax bî, apo destê te sax be...

- Derbasbûyî be, berxê min...

- Sax bî, Apê Hesen.

Wexta ku karê me qediya, me ji yên di malê de xatirê xwe xwest. Apê Hesen jî bi me re derket derve. Lê belê, cebirvan qet ji me re negot, li cem me bimînin...

Apê Hesen, heya derbenda gund bi me re meşiya.... Lê, heya derbendê deh caran ji me re got:

- Hûn, çend rojan li gel min bimînin, ez ê kêfxweş bibim. Ez ji ber helwesta cebirvan a ne baş jî bi navê gundiyan lêborîna me dixwazim...

Sax bî, Apê Hesen. Kar û barê me heye, li wî gundê hanê heval li benda me ne...

- Baş e, ez heya derbenda gund li gel we werim...

- Zahmet meke...

- Zahmeta çi berxên min. Hûn bi şev bi roj li wan çol çiyan, li ber sar û seqemê, dimînin ji bo ke...

- Her çiqas ku me bi Apê Hesen re got, zehmet nekişîne jî, ew bi me re heya derbenda gund, meşiya...

Min, di rê de ji Apê Hesen pirs kir:

- Apo helwesta wî cebirvanî li hemberî me çima wisa bû?

- Helwesta wî ziqim î, ji xwe re nekin xem û derd, ew zilam yekî tirsonek e.

Li derbenda gund, Apê Hesen ji me xatirê xwe xwest; me jî bi kefxweşî xwe di serejêr de berda, deştê...

Di serejêran de, ez nedimeşiyam; ez digindirîm. Ji ber vê yekê hevalê min, li paş min dima. Li erdê rast jî edî ez li kêleka hevalê xwe dimeşiyam... Heya gundê heval Ezîz, di nav rezan de, ez û hevalê min ê gundî, em li kêleka hev meşiyan… Di nav rezan de; me Ezîz û Bilind dîtin. Deh panzdeh xulek mabûn ku em bigîhijin cem wan, her du rabûn ser xwe dev biken:

- Heval Zirav, tu êdî dimeşê de zirek bûyî, tu meşê de, le kêleka hevalê xwe dimeşî...

- Hîna jî ez ê xwe di meşê de zîrek û bi hêz bikim, demek wê were ku hûn ê, di meşe de li paş min bimînin...

- Di axaftin û liva, Ezîz, Bilind û Efendî de eşkere bû ku di karê xwe de biserketine. Di rûyên her sêyan de neşwe diherikî. Her sê jî pir kêfxweş xuyanî dikirin:

- Ez bawer dikim ku hûn di karên xwe bi serketine?...

Her sêyan jî bi hev re gotin:

- Rast e heval Zirav... Piştre, Ezîz û Efendî ji axaftinê dev berdan, Bilind pê de çû:

- Me, bi merasîmeke girseyî termê şehît Husên rakir. Wexta ku me termê şehîd ji bajêr derxist, ew ê kor ê ku Efendî çavê wî kor kiribû, serokê faşiştan, hevalan ew gorî şehîd Husên kirin. Ji ber vê yekê em, pir kêfxweş in...

- Destên ên ku heyfa Heval Husên hilanîne kesk bibin...

- Min axaftina hevalê xwe, yê gundî û Bilind qut kir:

- Heval Bilind çiqas xelk tevlî merasîmê bûn?...

- Nêzî deh hezar kes tevlê bû. Li bajarê me cara yekê, girseyeke wisa qelebalix berhev dibe...

Em, her çar bi hevdu re çûn mala bavê heval Ezîz. Gundiyê ku di rewîtiya heya gundê cebirvan, bi min re hevaltî kiribû jî bi kefxweşî xatirê xwe ji me xwest:

- Heval, ez êdî xatirê xwe ji we bixwazim, zarok wê ji bo min têkevin nava mereqan...

- Em te bernadin, heya ku em, ji gund derkevin li gel me bimîne...

- Na, ez biçim mala xwe hîn çêtir e....

- Kêfa te...

Çiqas ku em, kêfxweşbûn ji rakirina termê heval Husên; cezakirina serokê faşistan, gundî jî ji me kefxweştir bûn. Neşwe ji rûyên wan jî diherikî...

Bi silavê, em ketin mezelê mala bavê heval Ezîz. Mezel bi mirovan mişt bû, me destên hin zilaman guvaştin, hin jî hatin rûyê me. Me jî destên ên rîspî ramûsandin.

Mala bavê heval Ezîz, bi şêniyên gund tijî bûn. Car caran zarokan, bûkan û keçan di derî re, an jî di çarçoveya pencerê re li me dinêrîn...

Wexta ku me hal û wexta hev pirsî, di wê kêliyê de ji me re sifre jî danîn. Şîva wan, wê êvarê xewre bû. Lê, ji cîranan jî kutilk û mehîr jî anîn ser sifreyê ...

Me têr xwar, me ji bavê Ezîz re got:

- Apo her hebe...

- Noş û can be. Lê, we tiştek nexwar, ez bawer dikim ku şîva me, ne bi dilê we bû...

Bi navê hemû hevalan:

- Na apo, şîv tam li gora dilê me bû. Xwarin û vexwarin ji serê me zêdetir bû...

Li kêleka bavê Ezîz, birayê wî rûnîştibû. Her digot bavê Ezîz:

- Hûn ay dikin,wextê ku ay dibe,hûn ay dikin...

Wextê ku me xatirê xwe ji bavê heval Ezîz xwest, ji me re got:

- Hîna zû ye, dinya jî bê bela ye. Rûnin gûz, mewîj û bastiqê bixwin; hînge biçin, ji wan tiştan hina jî li gel xwe bibin...

Bavê Ezîz ku gotina xwe bi dawî kir. Wê carê apê Ezîz, dora axaftinê wergirt, gotinên wî yên balkêş û yên ku nedihatin têgîhiştin dubare kirin:

- Hûn ay dikin, wextê ku ay dibe hûn ay dikin...

Me, xwe li paşîvê negirt, me xatirê xwe xwest, dayîka heval Ezîz tûrikek tijî gûz, mewîj, bastiq kir, da dest heval Ezîz.

Em, ji gund derketin. Me, berê xwe da nav rezan... Di rê de û ku em gîhiştin nav rezan jî Efendî, her bi henek:

- Heval Ezîz, şîrove bike wan gotinên balkêş ên apê xwe û bi mecaz. Hûn ay dikin, wextê ku ay dibe ,hûn ay dikin

Ezîz, ji pirsa Efendî, pir bi hêrs dibû, awirên xwe dizîvirandin ser wî, çavên xwe, lê zîq dikirin...

Lê, Efendî dev ji ya xwe ber nedida, gotinên apê heval Ezîz; hûn ay dikin,wextê ku ay dibe,hûn ay dikin, ji Ezîz dipirsîn.

Her ku Efendî ev gotin, ji Ezîz dipirsîn, her ku digot Ezîz wan gotinan şîrove bike. Ezîz jî mirûzê xwe tirş dikir, çavên xwe, li Efendî zîq dikirin... Lê, li dawî Ezîz ji neçarî, Efendî bersivand:

- Mirov, ji destên te xilas nabe, xilasbûna mirov ji destên te ne pêkan e... Gotinên apê min ser girtî ne, wateyên wan gotinan jî wisa ne: Hûn, Apoyiyan tînin malên xwe, ji wan re alîkariye dikin. Lê wexta ku dijmin tê gund, gundiyan digire, li wan êşkenceyan dike. Hûn xwe li min û birayê min ê mezin hêrs dikin. Eger ku hûn dilsozên Apoyiyan in wexta ku dijmin hûn girtin, zext li we kirin xwe li me hêrs nekin...

Piştî henekên Efendî û şîroveya Ezîz, em kêlîyekê bêdeng bûn. Lê, Bilind ev bêdengî xira kir, got:

- Em ji mêj de neçûne wî bajarokî, nêzî Çiyayê Qizil. Li wê derê çi heye, çi nîne, em nizanin, li wî bajarokî hevalekî me hebû. Navê wî, Nedîm bû. Kar û xebatek kir an jî nekir, em qet nizanin...Ez, dibêjim heval Efendî û Zirav biçin cem wî rewşa wî û rewşa xebatê jî bipirsin, baştir e...

Êdî, em di rêya wesayîtan re nemeşin, car caran di şîverêyan re, carcaran jî em çolebir bimeşin hîn çêtir e..

Ez û heval Ezîz jî em ê, biçin bajêr karên me yê ku kêm maye em, temam bikin çêtir e...

Ez bawer dikim ku dagirker, zextên xwe li ser me bişidînin, heta pêkan e ku faşîstên sîvîl an jî yên leşkerî bibin desthilatdar...

Me her sêyan jî, daxwaz û nirxandinên heval Bilind, erê kirin. Em rabûn bi ser karê xwe de çûn... Dema ku me, ji hev xatir xwest Bilind gote me :

- Em ê li mala Paşo hev bibîn in...

*****

Hina me, sê çar gav navetibûn Efendî, dev bi ken berê xwe da min:

- Heval Zirav netirse rêya me, ne zehmet e, hêsan e. Tu zehmetiya rêya me nîn e..

- Ma di rêya me de hewraz nîn in?...

- Rêya me vê carê, serneşûv, berwar û rastayî ye...

- Baş e...

- Di ser rêka me de Çemêreş heye. Lê, em ê tê re bi hêsanî biborin...

- Tu dizanî?...

- Belê, heval Zirav...

Bi rastî, rêya me; rêyek hêsan bû. Lê belê, wexta ku em, di Çemêreş re derbasbûn ez gêrbûm, çend gavan jî avê, ez bi ber xwe xistim... Efendi, bi piyê min girt, ez rakirim. Piştre, me çem derbas kir.

Piştî ku me çem derbas kir, Efendî, qet henekên xwe bi min nekir. Di derheqê ava ku hêl diherikê de, mirov wê çawa derbas bibe agahî da min:

- Heval Zirav, tu dizanî bê çima tu ketî nava avê, avê te bi ber xwe xist?..

- Na heval...

- Ez, bawer dikim wexta ku te, lingekî xwe rakiriye ku tu gavekê bavejî, bê hemdê xwe te lingê xwe yê din jî rakiriye, ji ber vê yekê tu ketî xwarê û tu gêrbûyî.

- Ez nizanim, bê çawa gêrbûm. Lê , bawer im wisa li min hat...

- Careke din, wexta ku tu di avên ku pir bi hêl diherikin de derbas bûyî; Eger lingekî te, ji bo gav avetinê li hewayê be lingê te yê din jî bila saxlem erdê bigire. Eger lingekî te, saxlem erdê negire, wê wextê, av wê mirov bi ber xwe bixe...

- Ji bo ku te ez ji bo vê mijare hîn kirim sax be...

- Saxtir...

Em; ser danê êvarê gîhiştin cem hevalê xwe, bê qeza û bê bela... Lê, ji ber westandinê em, ji hev ketibûn, pêrîşan bibûn. Halê min, ji halê Efendî xirabtir bû. Ez, pêrperîşan bibûm.

Me, piştî xêr hatin, pirsîna hal xatir, dest bi agahî wergirtinê kir. Di derheqê xebatên herêmê de... Ji ber ku pêwîst bû, em bi lez bizîvirin, cihê xwe...

Hevalê me, kurt û kurmancî rapora xwe ya xebate da me:

- Li vê herême, me tu pêşketin bi dest nexistin, hin komikên dîtir, ên ku ji hin herêmên dîtir hêz wenda kirine, hemû li vir berhev bûne. Qadroyên wan ên sereke li vir in. Ji ber vê yekê em, bi pêş neketin...

Xelkê nava bajêr jî bi piranî Tirkmen in. Zanabûna min têra progandaya vê herême nekir. Min nikarîbû, xelkê vir qanî bikim.

Hest û daxwazên şêniyên vir cuda ne. Wexta ku ez, qala heqê Kurdan ên netewî û demokratîk dikim, xelkê vir wisa bersivê didin min:

- Em ne Kurd in...

Ez jî ji xelkê vir re dibejim :

- Ez jî ne Kurd im. Lê, ez ji bo daxwazên Kurdan ên demokratîk û netewî dixebitim. Di vê mijarê de kî bixebite, ev yek ji bo wî serbilindî ye; xebateke bi rûmet e...

Siberoj zû me, xatir ji hevalê xwe Nedîm xwest. Me berê xwe da gundê Paşo... Di rê de di navbera min û Efendî de kêm axaftin pêk hat... Tenê ez, du caran bi Efendî re axivîm; careke min, rewşa rê jê pirsî, careke jî min, cihê ku em ,êdi di Çemêreş re biborin jê pirsî...

Efendî, dev bi ken ez bersivandim...

- Rêya ku em, têre bizîvirin rêyeke hêsan e. Bi piranî rasteyî ye, hewrazekî biçûk, li pêşiya me heye. Çem jî kûr e. Lê, av di vê derê re hêdî hêdî diherike… Efendî, bêyî ku ez jê bipirsim di derheqê gundê ku em, di kêlekên wan re biborin jî agahî dan min:

- Li kêleka çem dehpanzdeh gund, ne alîgirê me ne... Di nav wan gundan de hin gundên faşîşt jî hene...

Pêwîst e, em ji wan gundiyan xwe biparêzin. Bi taybet jî ji yên faşişt, em xwe biparezin.

Em, di Çemêreş re bi hêsanî borîn.

Çemêreş tevlî çemê Firatê dibe. Em nezikî Firate di Çemêreş re borîn.

Çemê Firatê, bi heybet û bi aram diherikî. Me her duyan jî bi kêfxweşî Firat temaşe kir.

Nêzî gundên ku ne alîgirên me û faşîşt jî têde hebûn, em ketin nav baxçeyekî gindoran. Efendî gindorek mezin ji mêwê qut kir; qet qet qelişand. Min, dusê qet xwarin. Lê, Efendî negot yek negot du, gindor xwar û xwar, gindor hemû xilas kir.

Min çend caran lê heytan:

- Tu yê nexweş bikevî, mal neketo, ka ne ya te ye, lê kadîn jî ne ya te ye, dinya pir germ e, tu yê jahrî bibî...

Ne xema Efendî bû. Heya ku gindor qedand, her gez li gindor dida, hem gez lê dida, hem jî bi min re daxivî:

- Tiştek bi made min naye, tu xeman nexwe...

Piştî ku Efendî têr xwar, bi destê xwe jî, devê xwe pak kir. Em rabûn bi rê ketin...

Lê, li me bû tarî, me nikaribû xwe bavejin gundê Paşo. Ji ber vê yekê, li deştê nezî gundekî, şêniyên wî gundî dostên me, em man.

Em, bi awayekî bi dizî, li kêleka gund çûn malekê, maleke ku em jê bawer û ewle...

Cihê ku em, bi şev lê bimînin me, ji malxwê re got... Malxwê:

- Ew rezê ku hûn îşev tê de bimînin. Ê min e, beriya ku roj hile ez ê we hişyar bikim...

Destê sibê; gundî bi lez û bez hate cem me, gundî pir tirsiya bû. Kut kuta dilê wî bû. Bi kotekî gotin ji devê wî derdiketin. Ji liva zilam em tedigîhiştin ku tiştekî xirab qewîmiye... Gundî, piştî çend xulekan, gote me:

- Rabin rabin ji wir biçin, şoreş bûye, her derek bi wesayîtên leşkerî û bi leşkeran dagirtiye....

Wexta ku gundî ji me re got, her derek mişt leşker e. Me fehm kir ku derbeya faşîst a duwazdehê îlonê pêk hatiye... Ez bi lez û bez rabûm ser xwe. Lê belê, Efendî nikarîbû rabe ser piyên xwe. Da xwe da xwe Efendî, disa jî nikarîbû rabe ser piyên xwe, wek gêjan li Efendî hatibû... Min, bi çengê Efendî digirt, radikir ser piyan, ew disa gêrdibû, di dawî de gote min:

- Ez, bawer dikim ku ez jahrî bûme. Ez radibim ser piyan hişê min diçê… Çokên min sist dibin ez nikarim xwe li ser piyan bigirim. Tu biçe, ez ê hêdî hêdî li dû te werim, li mala Paşo em ê hevdu bibînin...

Ez ji, cem Efendî û gundî rabûm. Min berê xwe da gundê Paşo...Gundiyê dostê me; li dû min:

- Heval, li xwe hişyar be, bila te negirin, şehîd nekeve tu yê ji kîsê me, biçî...

- Xeman nexwe, tiştek nabe...

Ez, gîhiştim ber deriyê hewşa mala Paşo; li eywana xanî, Bilind û Ezîz rûnîştibûn. Wexta ku çavên wan bi min ketin, her duyan bi hevdu re bi dengekî bi heyecan û bi tirs ji min pirsîn:

- Heval, kanî hevalê te? Ew li ku derê ma? Çima, ne li gel te ye? Ma qey, belayek hate serê wî?...

- Na heval, tiştek nehatiyê serê wî, ew bi jahrî ketiye. Saetek an jî du saetên din ew jî wê bigihije me...

Paşo jî, kevaniya Paşo jî wexta ku gotinên min guh lê bûn, xemgîn bûn. Lê, jina Paşo ji Paşo xemgîntir bû...

Jina Paşo, dîsa jî rû bi ken ez pêşwazî kirim...

- Berxê min, derbasî mezel bibe...

- Sax bî dayê...

Ez, derbasî mezelê mêvanan bûm. Heya ku Efendî gîhişt mala Paşo bêdengiyeke; bi tirs, bi fikar, di mezel de bi bandor bû... Wexta ku Efendî gîhişt cem me, bêdengî xira bû...

Beriya me; jina Paşo, çav bi Efendî ket. Jina Paşo, bi dengekî bilind:

- Efendî tê, Efendî te, çavên me ronahî bin, piştî çend xulekan wê li cem me be...

Em, hemû rabûn ser piyên xwe, li ber deriyê hewşa mala Paşo, li benda Efendî sekinîn.

Efendî, gîhişt cem me; lê pêrpêrîşan bû. Xwe bi kotekî li ser piyan digirt. Jina Paşo, ji min pirsî:

- Heval çawa bi jahrî ket?...

Nêzî çemê Firatê me, Çemêreş derbas kir. Me nivro gindor xwar, heya êvarî jî em meşiyan, tîna tavê pir germ bû. Bi şev em li nav rezekî doste me raketin, sibe zû em rabûn ku hale wî wisa ye..

- Eger şîr vexwe, wê sax bibe...

Jina Paşo; zerikek şîr ji Efendî re anî; Efendî şîr vexwar, hema vereşiya... Piştî ku Efendî şîr vexwar û vereşiya; hişê wî hat serê wî, rûyê wî yên zer bibû xwîn hatê, rûyê wî sor bû..

Êdî , jina Paşo, dest bi henekan kir:

- Ma, tu çiqas yekî çilekî. Ka ne ya te bû lê, kadîn jî ne ya te bû. Tu ewqas petêx dixwî. Hevalê te Zirav, kêm petêx xwariye, ji ber vê yekê jahrî nebûye...

Efendî, ji neçarî gotinên jina Paşo qebûl kirin.

- Tu rast dibêjî xwişka min; ez yekî çilek im.

Lê, wexta ku Efendî got, ez yekî çilek im, ev gotin ji gewriya wî bi zorê derket...

Jina Paşo, fehm kir ku Efendî jê xeyidiye. Ji bo ku dilê Efendî xweş bike:

- Ez bim, ez birçîbim, ez ê jî ewqas petêx bixwim...

Jina Paşo, hem kevaniya malê, hem jî malxwê bû… Li malê, qet Paşo nedaxivî...

Paşo jî li kuncikeke mezêl rûdînişt. Hêdîka , qandî ku em guh lê bibin, xwe bi xwe re digot:

- Ma qey, ez li vê malê, heme. Ez li vê malê nîn im...

Jina Paşo jî dora axaftinê nedida me. Serpêhatiyên xwe, ji me re vedigot. Serpêhatiyên taybet; serpêhatiyên çawa bi mêrê xwe re zewicî ye :

- Carekê Paşo hatibû, gundê me, li ser kaniya gundê me. Çavên wî bi xwîşka min a biçûk ketibû. Bi dîtina xwişka min, dilê Paşo dikeve xwişka min. Bi lez û bez xwazgînvan rê kiribûn mala bavê min, xwîşka min xwestibûn, ji Paşo re...

Bav û dayîka min jî li şûna xwîşka min ez dame Paşo... Ji ber ku ez, keça malê ya mezin bûm. Ez û xwîşka xwe di bin hev re bûn, kesî ez û xwîşka min ji hevdu dernedixistin. Heta li gundê me hin mirovan bi navê min gazî xwîşka min dikirin, hina jî bi navê xwîşka min gazî min dikirin.

Piştî ku Paşo xwîşka min xwest, dê û bavê min jî soz dan dê û bavê Paşo hefteyekê, daweta me çêbû. Ez, li Paşo markirim, ji şeva zîfafê heya hefteyekê, Paşo ev yek nedizanîbû... Piştî hefteyekê min, ev yek ji Paşo re got. Paşo, ji vê yekê qet bêzar nebû, bi tîqetîq keniya, kenê Paşo bi dengekî bilind, demekê berdewam kir...

Roj çû ava. Di qemika êvare de, jina Paşo li me heytan:

- Hilo, hilo rabin, du bataniyan û qetek jî naylon ji bo xwe bigirin. Êdî, di nav nivînan de, ji bo we razan nîne, herin li çolê razin. Ew gundê cîranê me, derdora wî gundî daristan in. Bi şev jî bi roj jî li çolê bimînin. Heta êdî, bila lingên we bi gundan nekevin, bila gundî we kêm bibînin, tu caran xwe bê nan û bê pêxwarin jî nehêlin. Mezinên me, digotin nan heval e...

Em, ji mala Paşo rabûn, batanî û naylon jî me avet ser milên xwe û me berê xwe da daristanên çaman... Lê, wexta ku me xatirê xwe xwest jina Paşo, ji me bi hêrs bû:

- Min, ji we re gotinên dinya dîtî gotin; we gotinên min avêtin paş guhên xwe, kanî tûrikê ku min, ji bo we nan û pêxwarin xistiyê?...Çû, tûrikê ku nan û pêxwarin xistiyê anî, da dest heval Ezîz, Gote me :

- Oxira xêrê ya we be, berxên min...

Wexta ku havînê mirov li nav daristanên çaman de dimîne, dinivi pelên darên çaman li erdê wek doşekan li mirov tên. Dar jî ji mirov re dibin balîf, mirov hem pala xwe didiyê, hem jî wexta ku mirov dinivi, mirov serê xwe dide ser dibe balîf ji mirov re, di şer de jî ew dar palpiştiyê ji mirov re dikin, mirov re dibin kozik…

Wexta ku ba tê, daristanên çaman, dengekî wek fîtikê derdixin. Mirov dibêje ku darên çaman li fîtike dixin. Mirov, ji wî dengê wek fîtikê pir kêfxweş dibe... Lê , demsala zivistanê wexta ku bakur tê, mirov ji fîtika nav daristanên çaman ditirse...

Me; her çaran batanî, xistin bin naylonê. Em, li ser pelên çamên ku li erdê, nivistin... Lê, piçekî berf dibarî. Li ser naylona me jî nêzî tiliyekê berf berhev bibû. Bi dorê ji bo ewlekariya xwe me, nobet digirt. Nobetdarê me yê dawî, Efendî bû. Em, bi derengî bi hilatina rojê hesiyan. Ji ber ku heya tam tava rojê bilind dibû, li cihê ku em tê de, bandora tavê lê dibû.

Ez û Efendî, di navbeyna her du hevalên xwe yên dîtir de nivistibûn. Lê, heya siberoj di navbera Ezîz û Bilind; li ser bataniyê û naylonê pevçûn hebû... Car caran, Bilind batanî û naylon dikişand dikir bin xwe, car caran jî Ezîz wisa dikir...

Di vê pevçûne de anîşka Ezîz li derve ma bû. Anîşka Ezîz req bibû, tewizî bû. Anîşka wî yê destê çepê rast nedibû...

Em; ji xew rabûn, nêzîkî me, şivanekî pezê xwe diçêrand. Em çûn cem wî, me bataniyên xwe û naylona xwe jî veşart.

Me, taştê û firavîn, li cem şivan kir yek... Efendî, ji bo ku wek Ezîz û Bilind, xelkê herême bû ji bo ku tim û tim di nav gel de mabû taybetmendiyên xelkê herêmê baş dizanî...

Wexta ku Efendî, dixwest em, tiştekî guh lê bibin, bi dengekî bilind xwe bi xwe re diaxivî,

Di qonaxa me ya di nav daristanê de heya cem şivan, digot:

- Ji her kesî re şapûr şûpûr, ji min re yarabî şukir... Ev gotin, Efendî pir caran dubare kir...Wexta ku Efendî ev gotin wek risteyekê her digot, Ezîz û Bilind dikeniyan... Lê, ez ji gotina Efendî matmayî dibûm. Min, ji vê gotinê tiştek fehm nedikir û min tu wate jî nedida vê gotinê. Lewre, min ji Efendî pirsî:

- Heval Efendî, ev çi gotina te ye; ji her kesekî re şapûr şûpûr, ji min re yarabî şukir, wateya xwe çi ye?...

- Heval Zirav, di gundê wî şivanî de jineke bi nav û deng heye....

- Pir jineke zîrek e...

- Heval Zirav, tu tênegîhişt, kijan rexê wê jîr e; kîjan rexê wê bi nav û dengê...

- Rast e heval, ez tênegîhiştim....

- Jineke rehet nesekinî ye...

- Ango, jineke doxîn sist e...

- Belê..

Axaftina min û Efendî bi gotina Ezîz, a “of” qut bû..

Bilind berê xwe da, Ezîz:

- Anîşka te çawa bû?..

- Anişka min, rehet bû. Di meşê de wexta ku canê min germ dibû, janeke ku mirov jê kêfxweş dibe, diket anîşka min, paşê ev jana ku ez, jê kêfxweş dibûm, qediya û anîşka min jî wek berê lêhat û rast bû.

Pezê şivan keriyeke mêşin bû. Ji cihê ku me, lê xwarin dixwar dûr ket. Şivan gote me:

- Bi destûra we ez, pez bizîvirînim.

Şivan rabû, çû nêzî pez çend kevir avêtin peşiya pez, pez berê xwe zîvirand ber bi cihê ku em, lê rûnîştine. Paşê şivan, pezê xwe, bi dengê: “he aw, he aw.” heya cem me anî, pez li derdora me çêriya. Em jî di nava pezê şivan ê mêşin de mabûn.

Wexta ku şivan ji cem me rabû, ji bo ku pezê xwe li derdora me berhev bike, heval Bilind gote Efendî û Ezîz:

- Ev şivan xweşmêr xuyanî dike. Mirov dikare ji wî bawer bike, an jî na?...

- Yekî baş e. Pir kar ji me re kiriye. Mirov dikare jê bawer bike.

Efendî jî bi dengekî nizm, bi hejandina serê xwe:

- Rast e, yekî baş e... ji bo ku min şivan cara yekê dîtibû min, xwe ker kir...

Şivan ku pezê xwe yê mêşin zîvirand hat li cem me rûnişt...

Bilind, ji şivan pirsî:

- Heval, em dikarin nêzî mala we stargehekê bikolin?...

- Rast e heval, em dikarin, bikolin. Em ê bi şev stargehê bikolin. Heval, an jî hevalên ku ji bo kolandina stargehê werin cem me, bi roj jî bi dizîka dikarin li mala me bimînin. Bila kes ji hevalan an jî hevalên ku li cem me kes wan nebîne; bilî dayika min, em ê di çend rojan de stargehê hazir bikin...

Em bûn sê komik; Ezîz û şivan, ez û Bilind û Efendî... Em bi wî awayî bi ser karê xwe de çûn. Karê me jî hazirtiyên demsala zivistanê bûn. Stargeh hazirkirin, qût veşartin û mirovên welatparêz ên ku ji bo me, serê xwe bidin, sira xwe nedin re peywendî danîn û peywendî xurt kirin bû...

*****

Em rabûn, bi awayê sê komikan bi ser karê xwe de çûn...

Mala ku ez û Bilind, çûyîne de yekî bajarî jî lê mêvan bû. Demeke kin, li gel me rûniṣt û rabû ji malê û ji me xatirê xwe xwest û çû... Wexta ku yê bajarî xatirê xwe xwest, Bilind jê pirsî:

- Bira, ji bo çi tu, vê şevê bi serê xwe tenê diçî. Şev tarî ye?...

- Ez, bi lez im bira. Ez ê heya ser rêya wesayîtan bimeşim. Eger ku bextê min lêda, wesayîtek rastî min hat, ez ê biçim bajêr, lê ku bextê min lêne da, ez ê li wî gundî , li ser rêya wesayîtan heya sibe bimînim… Siberoj ez ê bi wesayîta destpêkê biçim bajêr...

Zilamê bajarî, ji mala ku em, lê mêvan rabû çû... Lê belê, şik û guman jî kete dilê me...

Bilind, ji malxwê pirsî:

- Bira, ev zilamê bajarî, ji bo çi hatibû mala te?...

- Heval, ji bo pezê serjêkirinê hatibû...

- Ji bo çi, pez nekirî?...

- Pir erzan xwest, weke ku nedixwest bikire...

- Ma, hûn wî zilamî dinasin?..

- Na,em nanasin...

Me û malxwê, ji zilamê bajarî pir şik û guman kirin. Em, ketin nav fikaran... Dibe ku zilam sîxur be... Şik û gumanên me, wexta ku me, liv û axaftina zilam tanî pêş çavên xwe hîna zêde dibûn.

Kevaniya malê, du cih danîn, ji bo me. Nivînên ji hiriyê, nivînên ji bo mêvanên qedr û qiymeta wan pir...

Kevaniya malê, wexta nivistinê gota me, bê tirs binivin, ez ê nobeta we bigirim...

Bilind gote kevaniya malê:

- Sax bî. Xwîşkê em ê, nobeta xwe bigirin. Tu, zehmetiyan nekişîne.

- Na, bira zehmetiya çi, ev ji bo me peywir e. Ez ê bi dil û bi kêfxweşî nobeta we bigirim...

Me, xwe di nav nivînan de dirêj kir. Heya ku xew kete çavên min, ez pê di hesiyam ku Bilind hişyar e… Lingekî wî di mezel de bû, lingekî wî li derve bû...

Min, terka xemê kir. Ez razam. Ez hîna saeteke nivistim an jî na, Bilind, deng li min kir:

- Rabe, hin mirov, di çemê jêr de ber bi vê malê tên. Bawer bike, ew zilamê bajarî em, îxbar kirin. Ew şeytan bû. Sîxûrê dijmin bû. Rabê, em ji vê malê derkevin. Em, xwe bidin pêsîra çiyan. Di nav daristanan de em, xwe veşêrin...

Em, ji malê derketin. Malxwê jî li gel me, me berê xwe da pêsîra çiyan... malxwê çend gavan, li cem me meşiya, paşê me ew zîvirand. Me gotê;

- Biçe, cem zarokên xwe. Bila netirsin... Di nav kelemên maziyan de heya ser danê êvarê me, xwe veşart. Nav kelemên maziyan germ dibe. Hem ji bo parastinê, hem jî ji bo ku mirov neqefile, baş e...

Ser danê êvarê me, xwe bi hişyarî berda mala ku duh bi şev em lê bibûn mêvan...

Malxwê û kevaniya wî bi dengên me, hatin ber derî... Em, bê tirs û bi kêfxweşî pêşwazî kirin. Beriya ku ji me re sifre deynin; malxwêyê malê, behsa hatina leşkeran û helwesta wan kir:

- Piştî ku we, ez bi rêkirim malê; ez, zîvirîm mala xwe. Piştî zîvirîna min çend xulekan leşker gîhiştin mala me... Fermandar, li me gefxwarin; gote me:

- Zarokên xwe, ji malê derxînin. Em ê agir berdin malê...

Me, ji fermandarê leşkeran re got :

- Ma qey çi bûye, çi qewimiye ku hûn ê mala me bidin ber agir?..

Wî fermandarî ji me re got: "Du Apoyî, li mala we ne. Hûn ê yan wan radestî me bikin, an jî em ê agir berdin mala we. Bila mal jî ew jî bi hev re bişewitin...

Min jî ew bersivand:

- Fermandar beg tu şaş e. Şaş agahî dane te, kes li mala me nîn e, kerem bikin, li malê bigerin...

Piştî axaftinên min û wî ziqimî. Ketin malê, kun kun lê geriyan, bi sîxên dirêj, di kadîne de çiqas risî û ka hebû ew sîxan e, têre kirin û derxistin,têre kirin û derxistin....

Ji lêgerînê ku bê hêvîbûn, îcar dest bi gefxwarinê kirin. Awirên xwe zîvirandin ser me, çavên xwe li me sor kirin, li dawî gotin me:

- Hûn û zarok derkevin derve, em ê agir berdin malê...

Kevaniya min, çû keça min a di dergûşe de ji xew rakir. Zarokên min ên dîtir jî ji tirsa bizdan... Ji tirsa digîriyan, dest û lingên wan dilerizîn...

Wexta, bawer kirin ku hûn ne li cem me ne, em li xwe mikur nayên, em nabêjin ku du Apoyî hatin mala me û çûn. Ew fermandarê wek sayên har, ew fermandarê ku gef li me dixwarin, ji nişqa ve bû zilamekî milayîm. Dest bi baş bûna dewlete kir. Çawa dewlet ji miletê xwe hez dike, Apoyî çawa bê dîn û îman in. Çawa dixwazin Tirkiye têxin bin destên komînîstan, çawa dixwazin Tirkiye parçe bikin, çawa

leşker bi şev û roj xelkê ji Apoyiyan diparezin, çawa leşker li van çol û çiyan ji bo xelkê tî û birçî dimîne, kir... Qandî ku zimanê wî sabavî zîvirî ji me re xweş kir...

Axaftina wî ya dawî jî: “Bila careke din Apoyî neyên mala wê. Eger ku hatin jî bi darê zore; pere, xwarin û kinc ji we xwestin, tiştekî nedin wan, bi lez xeber bidin me.” Ev got û ji me xatirê xwe xwest. Bi rê ketin.

Kevaniya malê:

- Îşev li cem me bimînin, berbanga sibê ji cem me biçin...

Bilind:

- Sax bî. Îşev pêwîst e em, biçin gundekî dîtir. Li wî gundî karê me heye...

Malxwê jî xwest ku em li cem wan bimînin:

- Em ê her hişyar bin, sayên me duh şev ne li gel me bûn. Li gel şivan bûn. Îşev pez jî şivan jî sa jî li cem me ne. Em ê bi dorê nobete bigirin, hûn jî bê tirs binivin. Bêhna xwe vedin...

Vê care jî min berê xwe da malxwê:

- Karê me; heye pêwîst e ku em bi ser karê xwe de biçin...

Malxwê û kevaniya malê:

- Îşev, em berxekî an jî karekî ji bo we ser jê bikin, şiva xwe bixwin hîngê biçin...

Bilind:

- Malhazirî ku çi hebe bînin em bixwin biçin...

Kevaniya malê sifre danî; mehîr,qelî,dimis û mast danî ser sifre ye...

Malxwê û kevaniya wî, serê her bêhnekê, digotin me: "ev sifre ne sifre ya we bû. Lê belê, em çi bikin,hûn bi lez in..."

Car caran min car caran jî Bilind:

- Xwarin hemû li gora dilê me ne, ji serê me jî zêdetir in...

- Careke din ku hûn bûn mêvanên me, em ê xwarineke li gora dilê we û dilê me ji bo we hazir bikin...

Jina malxwê jî gotina mêrê xwe erê kir.

Me şîva xwe xwar. Me bi gotina: "her hebe." xwe ji ser sifreyê vekişand.

Malxwê:

- Noşî can be...

Me ji wan xatirê xwe xwest:

- Em, êdî rabin em jî Kurd in. Gotineke pêşiyan heye: "Wexta ku, Kurdan têr xwar wê li pêlavên xwe binêrin."

Malxwê :

- Em îşev li gorî wê gotinê tevnegerin.

Em rabûn ser xwe, malxwê derî vekir, destê xwe dirêjî pêlavên me kir. Me her duyan jî destên xwe avet ber destê wî:

- Ne exlaqa me ye. Karekî ne di rê de ye jî tu, pêlavên me, bîne ber lingên me...

Me, pêlavên xwe pêkirin. Malxwê û kevaniya malê, nêzî çarsed pênçsed metre, bi me re meşiyan. Em, bi rê kirin. Wexta ku me ji wan xatir xwest, her duyan jî bi hev re:

- Herin berxwên me herin. Bila we şehîd nekin we negirin. Hûn ê ji kîsê me biçin, me ji bîr nekin, yek caran werin mêvandariya me, em dikarin we veşêrin, biparezin, stargehekê ji we re çêkin...

Heya mala ku Efendî, lê dimîne, em careke tenê bi hevdu re axivîn:

- Heval Zirav, di nav jinên Kurd de; jinên wek jina îşev ku em mevanên mala wan, jinên jîr, mêrên ku wek mêrê wê, mêrxas hebin tu caran zewala gelê Kurd nabe û Kurd têk naçin. Gelê Kurd wê her bi ser keve...

- Ez bi dil û can tevlî vê gotina te dibim...

Em, nêzî mala ku Efendî, li benda me, bûn. Sayên wan bi me hesiyan, sayan kir hewt hewt, sa li me reyîn. Bilind çend caran bi dengekî bilind got: "Malê, malê..."li ser dengê Bilind xortek, pîremêrek û Efendî derketin derve...

Pîremêr :

- Hûn kî ne?..

Bilind:

- Em in, em rêwî ne...

Wexta ku Bilind got: "Em rêwî ne." Efendî, got pîrêmêrê: "Hevalên me ne, bila derbasî jor bibin..."

Beriya ku em, hal û xatirê hev û din bipirsin xortê malê, ji me re doşek danî. Ji bo ku em pala xwe jî, bidinê balîf jî danîn paş doşekê... Hîna em nû rûniştîbûn ku dîsa sayan kir hewt hewt. Bi reyîna sayan Efendî, wek birûskê derket derve, bi dengekî pir bilind, bang kir:

- Ew kî ye, vê şevê li vir tu li çi digerî?... Bi dengê Efendî sa hîna har bûn; dengê sayan çû ezmanan… ji ber reyîna sayan Efendî, dengê zilamê li derve nenasî...

Xortê malê, çû sayan bêdeng bike. Li ber deriyê malê deng li sayan kir:

- Hoşt, hoşt...kolo, çavreş bisekinin... Bi deng kirina xort sa bêdeng bûn.

Îcar Efendî disa pirsî:

- Ew kî ye?...

- Ez im, ez Ezîz im...

Em qet ne li benda heval Ezîz bûn. Bi awayekî sosret min û Bilind li çavên hevdu nêrî. Me bi çavên xwe ji hevdu pirsî:

- Ma gelo, ji bo çi hat. Ma , tiştek ne di rê de qewimiye?...Karê wî hebû, pêwîst bû stargeh hazir bikira?...

Heval Ezîz, derbasî mezel bû. Em, her çar heval li kêleka hev rûnîştin...Wê şevê, çiqas ku malxwê, xwest ku bi me re biaxive jî em pir westiyayî bûn, malxwê her ku dest bi axaftinê dikir, em xilmaş dibûn, li dawî malxwê:

- Heval, ez bawer dikim ku hûn pir westiya ne. Em ji we re nivînan deynin hûn binivin...

Bi navê me, heval Bilind:

- Apo, pêwîst nake. Em ê, wisa binivin.

- Heval, bi dilê we ye. Em ê nivînan deynin, hûn dixwazin li cihê xwe rûniştî binivin, hûn dixwazin di nav nivînan de binivin. Hûn di vê mijare de serbest in. Em, li we zorê nakin...

Ji xwe, nobet pewîst nake. Sa hene bi reyîna sayan, ez ê her li derdora malê binêrim...

Em bi şewazekî rûniştî nivistin. Lê, heval Efendî gote me, ez ê her hişyar bim. Hûn bê şik û guman binivin...

*****

Di berbanga sibe de Efendî, em ji xew hişyar kirin. Ji xwe malxwê û kevaniya malê jî hişyar bûn.

Em, her sê heval ji xew rabûn. Bi hişyarbûna me bûka malê jî hişyar bû. Bûkê duh şev nan lê dixist. Nanê sêlê, nanê tenik; êvarî bûk şermok xuyanî nedikir. Lê, sibêhê pir şermok xuyanî dikir...

Me, xwest ku dest û rûyên xwe bişon. Bûkê, misînek ava germ, sabûn û teşt anî. Xwest ku avê li dest me bike. Me, nehişt. Me dest û rûyên xwe şûştin...sifre ji bo me danîn;

Sifreyek dewlemend bû. Rûne nîvişkê, mast, penîr, dims, çay...

Me taştêya xwe xwar. Bilind bi henekî:

- Dibêjin ku Kurdan xwarina xwe xwar, çavên wan wê li pêlavan be. Em jî ji xwe Kurd in, destûra me bidin em rabin...

Malxwê:

- Rabûna we, ne bi dilê me ye. Lê belê, eger ku karê we yê bi lez hebe destûr a we ye...

Beriya ku em, xatirê xwe bixwazin malxwê, ji kevaniya malê re got:

- Nan heval e, yên wek we derketina çol û çiyan, pêwîst e nan her ji gel wan kêm nebe...

Bi navê me, Bilind ku çiqas got: “pêwîst nake...” Efendî, bi axaftinê ket navbera Bilind û malxwê:

- Em ê biçin aşê Çavşîn....

Me, cara duyemîn xatirê xwe xwest. Berê xwe da aşê Çavşîn... Malxwê û kevaniya malê, li pê me:

- Herin berxên me herin, bila we negirin, şehîd nekevin, hûn ê ji kîsê me biçin...

Di meşê de, qet deng ji me derneket. Lê , Efendî her ji xwe re digot:

- Ev şeva borî, ew çi bûyera sosret bû ku li pêş çavên min qewimî...

Wexta ku Efendî dixwest ku em, axaftinên wî bibhîzin bi dengekî qandî ku em, bibhîzin bi xwe bi xwe re diaxivî. Vê carê jî wisa dikir...

Min, çend caran bûyera ku Efendî behs dike xwest ku ez, jê bipirsim. Min ev yek di dilê xwe de bir û anî, bir û anî. Lê , Bilind ev yek beriya min, ji Efendî pirsî:

- Efendî, ev bûyera ku duh şev li pêş çavên te rû da, bûyera sosret ku bi qala wê kirinê, te em ker û gêj kirin, tu yê ji me re vebêjî?...

- Tu her bijî! Heval Bilind, min dixwest ku ez wê pirsê ji Efendî bikim. Lê, te beriya min ew pirs jê kir. Wê emrê te, ji emrê min dirêjtir be...

Efendî, êdî nikarîbû hemberî me li ber xwe bide, gote me:

- Em, li cihekî rûnên, bêhna xwe vedin, ez ê bûyerê ji we re vebêjim...

Em, kêliyekê meşiyan. Li cihekî guncav em rûnîştin. Efendî, dest bi bûyera duh şev li pêş çavên wî borî, bi gotina wî bûyera sosret kir:

- Gotineke pêşiyan wisa heye, Kurd dibêjin : “Di bin lehîfê de şerm nabe.”

Hîna Efendî, dest bi axaftina xwe nû kiribû Ezîz, li Efendî bi hêrs hat:

- Efendî, em naxwazin ku tiştên bin doxînê tu, ji me re vebêjî... Li ser hêrsbûna Ezîz, Efendî xeyîdî, rabû ser xwe:

- Bi xatirê we. Êdî hûn careka din min nabînin...

Bilind û ez, em rabûn bi dû Efendî ketin, me ew zîvirand... Bilind, gote Efendî: “Ka, bûyerê ji me re vebêje...”

- Gotineke pêşiyan heye; dibêje: “Di bin lehîfan de şerm nabe.” Lê, hin tişt li pêş çavên mirov derdikevin vê gotinê pûç dikin... Duh şev, piştî ku hûn nivistin. Bûka malê ya ku nanê sêlê lêdixist, wê bukê, tu caran awirên xwe li ser hevalekî me nebirin, her awirên wê, li ser hevalê me bû. Lêxistina nan qedand, derî li paş xwe

vekirî hişt çû derve. Ji derve hat, disa berê xwe da heval, wek heval bixwe, li heval dinêrî... Çû, xwe li cem mêrê xwe dirêj kir çavên wê jî li heval; derpêyê xwe ji ber xwe kir ...

Me, axaftina Efendî bê dil guhdar kir. Ji bo ku Efendî, ji me ne xeyide, li cem me bimîne... Jixwe me; axaftina Efendî tam guhdarî jî nekir. Ji ber ku di mejiyê me de fikarên wek; hazirtiya zivistanê, hevalên me yên ku li ser sînor bûn, derbasî Binxetê bûn an jî nebûn hebûn. Ji ber vê me, kesî mudexaleya Efendî nekir... Ji bo ku Efendî dilê xwe li me negire, heya dawî me dengê xwe nekir..

Efendî ku gotina xwe ya dawî got, min û Bilind di heman demê ji Ezîz pirsî:

- Heval Ezîz....

Ezîz gotina me, di nîvî de hişt û bi hêrs:

- Ez têgîhiştim, ji bo çi we her duyan di heman deme de navê min hilda. We xwest hîn bibin bê ka, min û şivan stargeh hazir kir an jî na...

Me her duyan jî got:

- Rast e heval...

- Na. Me, stargeh hazir nekir. Li cihê ku me stargeh dikola, kevirekî mezin di wî cihî de derket. Me xwest ku em wî kevirî, ji wî cih derbixin, me nikarî. Di dawiyê de me, têde dînamît teqand, ji ber dengê teqandina dînamîtê, gelek mirov bi me hesiyan. Me jî li wê derê dest ji hazirtiya stargehê berda...

Ezîz ku qala dînamîtê kir, bû terqîniya Efendî. Efendî keniya. Lê Efendî, bi destê xwe devê xwe girt, ji bo ku Ezîz pê ne hesê. Lê , dîsa jî Ezîz bi kenê Efendî hesiya... Wexta ku Ezîz axaftina xwe xilas kir. Efendî, destê xwe ji ser devê xwe rakir û bû tîqêtîqa wî keniya, dev bi ken:

- Yekî wek min, yekî ku mixê serê wî kêm jî weke te nake...

Bilind, bi axaftinê nîqaşa di navbera Ezîz û Efendî qut kir:

- Xeman nexwe heval Ezîz. Em ê, li cihekî din stargehê hazir bikin...

*****

Efendî:

- Hûn li derve bimînin, ez ê biçim gazî aşvan Çavşîn bikim...

Efendî, ket hundirê aş, ew û aşvan Çavşîn bi hev re derketin derve. Hatin cem me. Çavşîn,destê me guvaşt, gote me :

- Ez dixwazim we hemûyan bi hemû heza xwe hembêz bikim. Lê , ez naxwazim ku kincên we jî wek kincên min spî bibin...

Aşvan Çawşîn, ku gotina xwe bi dawî kir. Yek û yek em ew hembêz kir...

Ji ber toza ard, her derek wî spî bû; simbêl, rih, bijang, kinc...

Ji ber dengê aş, em dûrî aş rûnîştin. Şagirtên aşvan ji me re kilorên aşvanan û çay anîn. Me û Çavşîn bi hevre taştê xwar. Lê, me kêm xwarin xwar. Me dev ji xwarinê berda, Çavşîn berê xwe da me:

- Ma xwarin ne bi dilê we bû, we kêm xwar?..

- Na, heval xwarin tam li gora dilê me bû. Lê belê, ev cara duyemîne ku em, taştê dixwin...

- Kêfa we ye, heval Bilind...

Me, çay vedixwar; Çavşîn jî hîna xwarin dixwar. Efendî, dest bi axaftinê kir:

- Çavşîn, axayê min çawa ye?..

- Kîjan axayê te, Efendî?...

- Zivistana borî ez, li gel wî şivan bûm..

- Ha, hate bîra min, tu behsa Apê Hesen dike... Ew, çi axa ye, axayê girara rijî ye, ew... Sê bizin, du gîsk,mihek, beranek û sêçar berx û karên wî hene...

- Ew, di dilê xwe de xwe, axa dibîne û dihesibîne... Zivistana ku ez, li gel wî bûm ji bo xwe, min di mala wî de, mezelek durust kir. Mezelê min, ji mezelê Apê Hesen xweştir û paktir bû. Di mezelê Apê Hesen de kêç û spî dilistin, govend digirtin...

Çavşîn; pê hesiya ku em, ji galegala wî û Efendî bi tenê bêzar dibin, berê xwe da me:

- Efendî, zivistana ku li gel Apê Hesen bû, pez tanî berdida wê quntara li paş aş. Dihat cem min, em bi hev û din re rûdiniştin. Heya ser danê êvarê... Hin rojan Apê Hesen, ji bo ku Efendî bişopîne, dihat cem me, ji dûr ve bi dengekî ku erd û ezman guh lê bin bang dikir:

- Efendî, Efendî, keriyê min çi lêhat, ma te kerî ji bir kir?..

Wexta ku Efendî, dengê Apê Hesen dibîhist, radibû ser piyan, ber bi Apê Hesen diçû:

- Kerem bike axa, çayekê vexwe, rûne... Pez li vê quntarê diçêrin...

Wexta ku Efendî, ji Apê Hesen re digot: “Kerem bike, axa...” Apê Hesen jî, digot Efendî:

- Efendî, tu rune ez ê, kerî bizîvirinîm... Çavşîn, berê xwe da me, her sêyan û pê da çû: “Bîranînên Apê Hesen û Efendî zor in. Ji bo ku hûn kêfxweş bibin û bêhnekê jî têr bikenin, min qala Apê Hesen kir... Ji bo we jî ji hevalên ser sînor, notek heye.

- Bide...

- Kerem bike heval Bilind...

Bilind, not wergirt û ji me re xwend: “Em li ser sînor asê man... Heyv û nîveke li vê derê, em bê nan, bê av û be xwarin man. Ava vexwarinê jî, bi kotekî bidest me dikeve, ji ber bêaviyê rişk ketin canên me... Çend kesen ku bîr û baweriya wan nemabû, çûn xwe radestî dijmin kirin...

Ji ber nameya hevalên li ser sînor, ên ku derbasî Binxetê bibin em, pir bêzar bûn. Mirûzê me, tirş bû, Efendî jî dest bi tevzan kir:

- Ev Apê Hesen nîne, yê ku gava din, min û Çavşîn behsa wî dikir; şevekê gelek berf bariyabû, ev jî ji xew hişyar nebîbû.... Roj çend werîsan bilind bû hîngê ji xew rabû. Dît ku pir berf e, beriya min, çû serbanê xaniyê xwe hawar kir; li çokên xwe xist, ji bo ku hemû cîranên wî jî pê bihesin, bi dengekî bilind:

- Wexta ku ez cîwan bûm, wî meretî nedihela ku ez razêm. Lê, di kalbûna min de ew, her radize. Xanî bi ser min de hilweşe ez pê nahesim...

Em, wê şewê li aşê Çawşîn man; Çavşîn jî li gel me nivist...

Siberoj em, ji xew hişyar bûn. Ji bilî min, ên dîtir bi îsotên biraştî, bi nanê selê yê tenik û teze, xuriniya xwe şikandin... Li, vê herêmê taştêya sereke, ev xwarin û vexwarin bû.

Lê, ji ber ku ji îsotên tûj ez, nexweş diketim; min jî taştêya xwe bi kilorên aşvan û çayê kir...

Me ji Çavşîn xatirê xwe xwest, berfê hûr hûr lêdikir. Wexta ku berf wisa dibare meş pir xweş e. Mirov, hemû derd û kulên xwe ji bîr dike... Mirov, her dixwaze ku bimeşe. Mirov naxwaze ku barîna berfê bisekine. Wexta ku berf wisa tê, ne operasyon, ne sîxur, ne jî yên ku xwe radestî dijmin kirî nayen bîra mirov...

Em, nêzî saetekê di bin berfê de meşiyan. Me, li bin dareke çinarê bêhna xwe veda. Efendî, dest bi axaftinê kir:

- Min duh şev xewnek dît...

- Eger ku li ser tiştên, di bin doxînê de ye, ne li ser xêrê be, eger ku ne wisa ye, li ser xêrê be, kerem bike, ji me re vebêje...

- Na. Heval Bilind, ne li ser tiştên bin doxînê bû, xewneke bi tirs û xof bû....

- Kerem bike vebêje...

- Duh şev, di xewnê de em, li malekê rûniştîbûn. Jina malê, ji me re firavîn hazir dikir, bi qasî bîst an jî bîst û pênc komandoyan, em dorpêç kirin, yekî çeka xwe xist singa heval Ezîz...

- We wextê, şehîd ketina min nêzik e...

- Xewnek ne li ser xêrê ye... Rast e heval Zirav...

- Hevalno! Ez, dibêjim îro ez, li nav gund bimînim. Ji bo ewlekariya me, hûn her sê jî li cem hev li malekê bimînin...

Me, her sêyan jî daxwaza Efendî erê kir.

Efendî, li nav gund ma. Em çûn li malekê dûrî gund bûn mêvan. Pîrejinek, bi tenê di mal de bû. Wexta ku çavên pîrejinê, li me ket pir kêfxweş bû. Bi gotina kerem bikin berxên min, em dawet kirin. Bilind:

- Metê, ji bo çi tu li malê bi tenê ye?...

- Berxên min, kur û bûka min çûn nav zeviyan. Piçek karê wan li nav zeviyan hebû, gaveka din wê werin...

Pîrejinê pir qedr û qiymetê me girt. Doşek ji me re danî, balîf jî danîn paş pişta me, çiqas ku me gotê: “Metê zehmet neke.” jî wê ji xizmetê qisûr nekir...

- Hûn ê, çi bixwin bêjin; bila meta we, ji we re hazir bike...

Bi navê me, Bilind her ew bersivand:

- Malhazirî, ku çi heye em ê bixwin metê...

- Pêşî, ez ji we re çayê hazir bikim; paşê jî ji we re germiyekê hazir bikim. Jixwe, xewre jî hazir heye..

- Metê, eger ku xewre hebe xwe newestîne germiyê hazir neke...

- Berxên min, ez ji bo we xwe newestînim, ji bo kê ez ê xwe biwestînim...

Pîrejinê, bi destê xwe girek bilind ku serê wî li ezmanan dikeve û ase destnîşanî me kir:

- Berxên min, hûn wî girê bilind dibînin?...

- Belê, metê...

- Navê wî girî, Oblaxe ye...

- Belê, metê ez navê wî girî dizanim...

- Berxên min, li wî girî, Eşkiya Bozo dima bi hezar û pêncsed hevalên xwe. Bozo bi rojan di wî girî de bi leşkerên romî re şer dikir; me jî xizmeta wan dikir...

Hîna axaftina Bilind û pîrejinê dewam dikir, kur û bûka wê ketin mezel... Wexta ku çavên her duyan li me ketin, dest bi gîri û axaftinê kirin:

- Uy! uy! Dewlet wê mala me bi ser serê me de hilweşîne; wê mala me bişewitîne...

Yek caran jî çavên xwe li pîrejinê zîq dikirin. Bi çavên xwe li pîrejinê gef dixwarin... Wek bêjin; bila, ew ji malê biçin paşê em ê, bi te re biaxivin. Em ê, çi bînin serê te, tu dizanî...

Me, qet li hemberî helwesta kur û bûka pîrejinê denge xwe nekir. Em rabûn, me her sêyan jî destê pirêjinê ramûsand, me xatirê xwe ji pîrejinê xwest. Pirejinê li dû me, bi awayekî kelûgirî, gote me:

- Herin, berxên mi herin; jin heye, jinik heye; mêr heye, mêrik heye. Li xwe muqayît bin, bila we negirin, şehîd nekin. Hûnê ji kîsê me biçin...

*****

Em, ji ber qarewara kur û bûka pîrejinê çûn malekê ku jin bi rastî jin; mêr bi rastî mêr... Mêr jî jina wî jî dinya dîtîbûn. Her duyan jî eşkere bû ku ji mêvanan re, ji eşkiyan re, ji şoreşgeran re, pir xizmet kiribûn. Ji liv û tevgera wan mirov, ev yek baş fehm dikir...

Malxwê malê:

- Ez bawer dikim ku we, firavîn nexwariye. Me firavîn xwar. Sifreya me, dewlemend bû. Kutilk û mehîr bû. Lê, germî jê kêm bû... Bila xwîşka we germiyekê ji we re çêbike...

Bilind:

- Xwarina hazir ji serê me zêdetir e, bila xwîşka me kar û barên tu xwarinên dîtir neke...

- Heval,ma qey tu ne ji me yî?..Li cem me, sifre bê germî dibe?...

Kevaniya malê, ji bo ku ji me re germiyê hazir bike, çû aşxanê. Mêrê wê jî gote me:

- Ez, hinek darên hişk hûr bikim, bila xwarina we dereng nemîne...

Em, her sê di mezelê mêvanan de rûniştîbûn. Me, terka xemê kiribû... Sobe xweş pêketibû. Me sakoyên xwe ji ber xwe, gorên xwe jî ji lingên xwe kiribûn...

Di wê kêliyê de leşkerekî ku kincên wî şînbelek, leşkerekî komando, hate ber deriyê mezelê ku em tê de rûniştine, lûleya çeka xwe xiste derî, bi Tirkî got:

- Teslîm olun...

Di heman demê de heval Ezîz, rahişte klêşê, jarjorek sax avêt leşkerê komando. Lê gule, li leşker neketin. Bû qerawera leşker, leşker paş de bazda... Wexta ku leşker bazda, ji tirsa dilê xwe, di pencerê de gule avetin me...

Ezîz, piştî ku gule li leşkerê komando reşandin klêş da Bilind:

- Ez ê, wan belgeyên me, veşêrim. Di bin maxa tûtinê de..

Ezîz çû, belgeyên me yên rêxistinê veşart. Hate cem me...

Em, her sê derketin eywanê, li milê eywanê yê çepê, sêlim hebû. Efendî û çend gundî jî li pêşberî eywanê sekinîbûn. Wexta ku Efendî em dîtin destê xwe li me hejand, bi destê xwe nîşan da me; xwe ji eywane bavêjin...

Destpêke Bilind xwe ji eywanê avêt, paşê min, paşê jî Ezîz...

Nêzî mala ku leşkeran em dorpêç kiribûn darên stûr hebûn. Bilind ku gîhişt nav wan daran demeke kin, heya ku me xwe ji eywanê avêt, bi leşkeran re şer kir...

Wexta ku min, xwe di eywane de avêt, leşkeran berê çekên xwe dan min. Ji ber ku min berê xwe da Çiyayê Spî, cihê ku min berê xwe dabûyê, kit û mit hin dar hebûn. Lê, nêzî mala ku leşkeran êrîş anîbû bi ser me du kilometre, raq, rût û xîz bû... Min, gavek diavet, çend gav jî paş paşkî gindir dibûm. Lê, bextê min lêda, gulêyên çekên leşkerên dijmin li min neketin. Bi wî awayî min hewraz qulipand. Deh an jî panzdeh xulekan ez, serberjêr meşiyam, malek derket pêşiya min, sayê malê gewr û qol. Wexta ku bi bêhna min hesiya li min reyî, bû hewt hewta sa.

Pîrejinek, ji malê derket li kuçik heytan:

- Qolo,qolo bisekin pîsê haram

Reyîna sa, sekinî. Hîna min ji pîrejinê re negotibû, çaxa te bi xêr metê, wê ji min re got:

- Tu bi xêr hatî, derbasî jor be...

Ez,derbasî mezelê mêvanan bûm. Pîrejin, ji mêvandariya min pir kêfxweş xuyanî dikir. Ez jî ji helwesta pîrejinê pir kêfxweş dibûm...Pîrejinê gote min:

- Gorê xwe, ji lingên xwe bike, bêhna xwe vede. Îşev li cem me be, em ê bikin galegal...

- Metê, li malê ji bilî te kes nîn e?...

- Bûk û nevîyên min çûn, ber pez; kurê min jî çûn mala jêr ku niv saetê dûrî mala me ye. Her sê jî wê ser danê êvarê bizîvirin...

- Tu neviyên te yên dîtir nînin metê?...

- Keçeke min hebû, wê jî şû kir...

- Berxên min, tu kî yî, tu çi digerî?...

- Metê, ez heval im. Apoyî me. Li wî gundê din di navbera, me û leşkeran de şer qewimî, em sê heval bûn, em ji hev belav bûn...

Wexta ku min qala şer kir, pîrejinê dest bi girî kir:

- Uy! Xwîniyên me hene; ew gundê ku we û leşkeran li hev xist jî pir nêzikî gundê me ye. Leşker wê niha werin gundê me. Eger te li vê derê bibînin wê mala me, bi ser serê me de hilweşînin, zû ji vir here...

Min, xatir jî ji pîrejinê nexwest. Ez, ji mala wê derketim. Min, bere xwe da maleke cîranê wê ku nîv saetê dûrî mala pîrejinê...

Ez nezikî malê bûm. Destpêke bi sa, bi min hesiyan. Malxwê malê, ji mal derket li sayan heytan, reyîna sayan birî, paşê jî deng li min kir:

- Tu kî yî zilam?...

- Ez rêwî me...

- Ji bo çi rêya te bi vir ket?...

- Ez, werim malê ez ê, bersiva vê yekê bidim...

- Vê gavê bide, hîngê were malê ...

- Na bira, ez werim jor hîn çêtir e.

- Eh! Wê wextê, kerem bike derbas be...

Ez, derbasî mezelê mêvanan bûm...zilam, li min nêrî û got:

- Tu ne xelkê vir e...

- Rast e bira.

- Tu, wek hevalan xuya dikî, hem jî tu pir westiyayî xuya dikî...

- Veşartin pêwîst nake, ez heval im û gotina te ye, ez pir westiya me.

- Ma çi qewimî, tu ewqas westiyayî?...

Min bi destê xwe, gundê ku me û leşkeran şer kiribû nişanî zilam da...

- Di wî gundê ku tê zanîn de me û leşkeran şer kir. Em sê heval bûn. Em ji hev qut bûn...

- Hevalên te Ezîz û Bilind bûn?...

- Tu ji ku dizanî hevalên min?...

- Ez dizanim, ji ber ku ez mîlîsê we me... Heval Bilind û Efendî jî li cem min in. Wexta ku sa bi te hesiyan, li te reyîn, min ew rêkirin kadînê, veşartin. Ez ê niha gazî wan bikim...

Mîlîsê me rabû. Çû, Bilind û Efendî anîn cem min. Em her sê, çend saetan ji hev qut bibûn lê, weke ku me, bi rojan hev nedîtibû, ew çend saet li me wisa dihatin. Me, hev bi hemû hêza xwe hembêz kir. Bi hesreta ku mirov ji dîtina hev bêhêvî be, û ji nişka ve hev bibîne me hev hembêz kir...

Demekê mezel ker û lal bû. Ker û lal bûneke bi kêfxweşî û bê tirs... Bilind ev yek xira kir:

- Em nizanin çi hate serê heval Ezîz, şehîd ket an jî dijmin ew sax girt, çi hate serê wî hevalî?..

- Xeman nexwe heval, ez ê herim ji gundiyan pirs bikim. Ji sedî sed xebera gundiyên me wê ji heval Ezîz hebin...

- Baş e, lê dîsa jî dilê min ne rehet e...

- Ez ê, îşev di derheqê heval Ezîz de agahiyan bi dest bixim...

Bilind, berê xwe da me:

- Ez dibêjim, îşev em li vir nemînin. Ev der nezikî cihê ku me û leşkeran şer kiriye...

Min û Efendî gotina Bilind bi serê xwe pejirand. Lê belê, mîlîsê me ji gotina Bilind, pir bi hêrs bû.

- Ji serê te heya binê piyê te reş bûye heval Bilind. Hevalên din jî pir westiyane. Ez, îşev û siberoj heya êvarî we bernadim. Hûn ji mala min jî biçin ez ê, ji we bixeyidim. Siberoj heya êvarî hûn mêvanên min in. Îşev ez ê biçim gund. Di derheqê heval Ezîz de hin agahiyan wergirim...

Bi rastî heval Bilind, te çawa wêrîbû, tu çi yekî wêrekî ku di vê demsalê de li çemê Şemkerê bide, hem jî bi berbi bakur...

Wexta ku lehî radibe, ew çem har û dîn dibe. Zinaran li ber xwe dixe, dibe. Zivistanê, biharê jî car caran ku lehî radibe, mirov ji gurm gurma vî çemî bêzirav dibe; ziravên mirov diqete. Te jî wexta ku lehî rabûye, li wî çemî da ye?...

- Heval Hesgir, di şer de, guleyên klêşa min qediyan, leşkerên dijmin nezîkî min bûn, di wê wextê de min xwe avêt çem. Eger ku ez, di çem de ber bi başûr biçûma ez xilas nedibûm. Eger ku dijmin, ez negirtima jî wê lehiyê ez bifetisandima, ji ber vê yekê ez ber bi bakur meşiyam...

Her ku min di çem de du sê gav diavetin, ava çem a rabûyî ez li kevir û daran didam, car caran jî min xwe bi lemiştê digirt. Bav û kalên me digotin: “wexta ku mirov bi ber lehiyê ket, xwe bi lemiştê digire.” Li min jî wisa hat...

- Ji bo me hemûyan derbasbûyî be...

- Sax bî...

- Ez dibêjim ku ez, biçim gundê me di derheqê Ezîz de hin agahiyan bigirim...

- Na. Heval Hesgir, sibe êvarî ku em di cem gund re derbas bûn, wê wextê em ê agahiyan bigirin çêtir e. Bila, şik û gumana kesî li ser te nebe...

- Kêfa te, heval Bilind...

- Ez ê êdî klêşa xwe bidim te, tu yê kleşê veşêrî...

Wexta ku Bilind bi mîlîsê me, Hesgir re got: “Ez ê klêşa xwe bidim tê veşêrî.” Terqîni bi Efendî ket; Efendî keniya lê, nexwest ku em bi kenê wî bihesin, bi destê xwe yê rastê jî devê xwe girt. Lê, em dîsa jî bi kenê wî hesiyan...

Bilind bi hêrs:

- Tu bi çi dikenî, tiştekî ku mirov pê bikene hebe, bêje em her sê bi hev re bikenin?...

- Heval Bilind, di serê mirovên vî gundî de wek min, mix nîn in...

- Ji bo çi, di serê wan de, mix nîn in?...

- Li jêr ew çemê ku te lêdaye, çem dibe du şax, di navbera her du şaxan de giravokeke biçûk heye, gundiyan di wê giravokê de çekên xwe veşartine...

- Eh çi bûye? Tu bi vê yekê dikenî, tîqtîqa te ye?..

- Heval Bilind, te hîna fehm nekir, çi bûye? Di nav me de yê serwext tu yî. Yê ku mixê wî tam tu yî. Tu dibêjî çi bûye, lehî rabûye; çek, bi ber lehiyê ketine...

- Vê gavê mejiyê min jî kar nake...

Heya roja dîtir ser danê êvarê, em li cem mîlîsê me Hesgir man. Em nêzikî mala, mîlîs di şkeftekê de man. Derdora şkeftê; darên berû, mazî, kevir û zinar bûn. Dar jî kevir jî wek kozikên xwezayî bûn.

Kevaniya mîlîsê me, bi her cureyekî xwarin û vexwarin ji me re hazir dikir. Ji bo şîvê, kutilk, xewre, mehîr, li cem van xwarinan jî ji sedî sed germî... Li vê herême, eger ku li ser sifreyê germî nebe ,ew ji bo wan şermeke mezin e..

Paşîva me jî, mewîj, gûz, bastiq bû...

Taştêya me jî, dew, li cem dew, çend îsotên biraştî, nanê sêle yê tenik û teze bû...

Lê, min nikarî bû îsotên tûj bixwim, ji ber ku ez, bi îsotan nexweş diketim...

Me, wê rojê firavîn û şîv kir yek. Firavîn û şivâ me kebab bû. Li cem kebaban jî dewê meşkê û îsotên tûj ên biraştî bûn...

Efendî xwe ranegirt, ji Hesgir pirsî:

- Ji mala te qet goşt kêm nabe. Ji duh heya niha em goştê teze dixwin. Te ewqas goşt, ji ku peyda kir?...

- Belê, heval min di zinarê ku li hember mala me, gakoviyek kuşt. Ji ber vê yekê li mala me goşt pir e. Goştê me xwar em ê bixwin, ê ku ji ber me bimîne jî em ê bikin qelî. Zivistanê ew qelî wê têra zarokan bike...

- Ez bawer dikim ku sêsed an jî çarsed kilo hebûye gakoviyê ku te kuşt?...

- Hîn zêdetir bû....

Em, danê êvarê ji şkeftê derketin. Me, her çaran jî berê xwe da mala Hesgir ji bo ku em, xatirê xwe ji jina Hesgir bixwazin..

Keçeke Hesgir ku hîna nû li ser çar lepkan digeriya hebû. Bilind, ew rakir hembêza xwe, pê şa bû:

- Emrê wê dirêj be, navê wê çi ye?...

- Navê wê Zîn e...

Me, xatirê xwe ji jina Hesgir xwest. Hesgir jî li gel me heya malên gundê jêr bi me re meşiya... Ji bo ku di derheqê heval Ezîz de hin agahiyan bigire çû malekê... Çûyîn û hatina Hesgir bû yek... ji bo ku şev tarîbû me rûyê wî nedidît. Mirûzê wî tirş e an jî na, bet benizê wî çawan e... Lê, gotin ji gewriya Hesgir, bi zore û bê dil derdiket:

- He...hev...heval Ez....Ezîz hatiye girtin...

- Çawa hatiye girtin?...

- Heval Bilind, piştî şerê di navbera we û leşkeran de, bi şev diçe malekê, ew mal jî bêbextiyê lê dikin..

- Kîjan mal, çawa bêbextiye lê dikin?...

- Hevalno! Malbatek li wî gundî heye. Ew malbat xizmê sîxurekî ne. Heval Ezîz ji bo ku pir westiya ye, ne li ser hemdê xwe bûye, diçe wê malê. Hem jî ji ber sermê qefîliye. Heval dema diçe wê malê, ew mala heval baş pêşwazî dikin, jê re nivînan datînin, heval dinivi. Paşê, wexta ku heval di xew de dest û piyên heval girêdidin, radestî dijmin dikin.

- Heval Hesgir ev kîjan sîxur e?...

- Efendî, wî şeytanî ji min çêtir nasdike...

- Kî ye ew ziqim, Heval Efendî?...

- Heval Bilind, axayek hebû. Tu nasdikî, carekî hin heval ji girtîgehê hatibûn berdan, ew jî hatibû serdana wan hevalan, hevalekî serdana wî qebûl nekiribû, silava wî jî negirtibû. Ji ber wî jî ranebibû. Ew roj ev roj ew zilam bi me re dijmintiyê dike... Beriya hukmê leşkerî ya faşist ya duwazdehê îlonê ev sîxur ne ewqas har bû. Lê piştî duwazdehê îlonê har bû. Li çol û çiyan kun bi kun dikeve pêşiya leşkeran li me digere...

Me, ji Hesgir xatirê xwe xwest. Lê, me nedizanî em ê li ku çend rojan xwe bistirînin, xwe veşêrin...

Di rê de Efendî nexşeyek cihê ku em xwe lê biparêzin, em biçinê, ji me re anî...

- Heval Efendî, em li ku bimînin û em çi bikin.?...

- Heval Bilind, edî hûn ji vê herême biçin çêtir e. Êdî hûn li vir nikarin xwe biparêzin. Heta hûn biçin Binxetê ji bo demeke kin hîn çêtir e...

- Em çend rojan xwe, li ku biparêzin?...

- Li pêşiya me sê gund hene. Di du gundan de şeytanên dijmin hene. Lê, li gundê dawî, tu sîxurên dijmin nînin. Em, li her du gundên jêr, hin pêdiviyên xwe yên wek nan, pêxwarin bigirin biçin gundê dawiyê ku li ser rêya me. Li jor gundê dawiyê ku li ser rêya me ye jî kuneke hirçê heye. Çend rojan li vê derê bimînin, paşe jî ku we qeys li xwe dît, derbasî Binxetê bibin...

- Ji bo çi em, li gundê dawî pediviyên xwe wernegirin?...

- Heval Zirav, ew gundî çiqas baş bin jî we nebînin çêtir e....

- Ma qey tu, li gel me nayî?...

- Na, heval Bilind ez, êdî ji we vediqetim. Eger ku ez, li gel we werim jî heya wî gundê ku kuna hirçê lê, an jî heya deştê ez ê werim. Ji bo we jî ne baş e; ji bo min jî. Eger, ez li gel we werim deştê yan ez ê bêm girtin an jî bême kuştin....

Em, gîhiştin gundê yekemin ê ser rêya me. Bilind berê xwe da Efendî:

- Li gundê jor kirîvên min hene. Ez û zirav biçin cem wan hin agahiyan ji wan em bigirin. Paşê em ê werin xatirê xwe ji hev bixwazin...

Ez û Bilind em çûn mala mezinê gund. Efendî jî li gundê jêr ma.

Kurê malmezinê gund, berê hevalê me bû. Lê malmezinê gund, kurê xwe bi destê xwe radestî dewletê kiribû.

Em, li mala mezinê gund rûniştin. Lê, em ji zilam qet ne ewlebûn û ne ji gundiyên ku li mala mezinê gund rûniştibûn em ewlebûn... Di awirên wan de bêbextî xuya dikir. Em, li ser doşekê rûniştîbûn. Lê, weke ku em li ser guniyan rûniştibûn. Di rûyên malmezin û yên ku li mala wî, bêbextî dihate xwendin....

Hîn em, nû rûniştîbûn ji kirivên heval Bilind du kes hatin. Gazî heval Bilind kirin, li derveyî mezel... Du an jî

sê deqîqan Bilind li derveyî mezel bi wan re axivî. Hat hundirê mezel, gote min:

- Em bi lez biçin, karê me derket....

- Eh! Wê wextê em rabin heval Bilind...

Dema ku Bilind li gel kirîvê xwe bû, bi wan re diaxivî, zilamek li kêleka min rûniştîbû. Her destê xwe diavet pişta min, dixwest deste xwe bibe ser çardehxura li pişta min. Lê, min ev fersend neda wî zilamî...

Me, xatirê xwe ji gundiyan xwest. Em, bi lez ji gund derketin. Deh panzdeh gundiyan da dû me. Me da xwe û em reviyan... Gundiyên ku li pê me, digotin:

- Nerevin! Werin teslîm bibin. Li Tirkiye şoreş pêk hat. Eger hûn teslîm bibin, wê we zû berdin eger hûn teslîm nebin, wê we bigirin. Bi salan hûn ê di zîndanê de bimînin. An jî wê we bi dar ve bikin.... Eger hûn teslîm bibin, li we êşkence jî nakin....

Di navbera me û gundiyên ku li dû me; gundiyên ku dixwestin me bigirin, deh panzdeh metre mabû. Bilind gote min:

- An tu çend guleyan bavêje wan. An jî çardehxura xwe bide min, ez çend guleyan bavêjim wan. Eger, yekî ji me bigirin jî; yek ji me ji destên wan xilas bibe...

- Na. Heval Bilind, em yek car tu guleyan bernadin wan. Derbenda gund nêzîkî me ye. Em di derbendê de biqulipin, em ê ji dest wan xilas bibin...

Min gotinên xwe xilas kirin. Em gîhiştin derbenda gund. Me xwe serberjêr wek bayê kur berda. Piştî me derbend derbas kir. Gundiyan dev ji me berda... Me dît ku gundiyan êdî dev ji me berda me, bêhna xwe berda. Em, ber bi gundê ku Efendî li benda me meşiyan, lê, li pêşiya me, çavên me bi hin gundiyên ku çek di destên wan de ketin... Ew gundînan, ber bi me bi lez dimeşiyan... Wexta ku me ew gundî dîtin dîsa bû kut kuta dilê me... Em, her du jî pir tirsiyan.

Me, xwe melisand. Gundî di pêşiya me re derbas bûn, çûn. Me jî berê xwe da cihê ku em, Efendî lê bibînin. Em, gîhiştin wî cihê ku Efendî bi çewalek qût li benda me ye..

Efendî, ji ber me rabû ser piyan:

- Ez bawer dikim ku hûn baz dane. Hûn pir westiyayî û pir tirsiyayî xuyanî dikin?...

- Belê, Efendî hin gundiyan da dû me, ku me bigirin, radestî dijmin bikin. Ji ber vê yekê em, pir tirsiyan. Lê, ew bi serneketin...

- Ez dizanim, ji wan gundiyan hinekan ji min re gotibûn ku ziqimekî dewlemend, li wî gundî heye; kurê xwe radestî dewletê kiriye, ji bo ku dewlet kurê wî berde, soz daye dewletê ku çend hevalan an bigire radestî dewlete bike, yan jî ixbar bike bide girtin....

- Belê, kirîvê min jî ev yek ji min re got...

- Ez, bawer dikim ku eger kirîvê te ne li gund bûna, wan sîxurên xwe firoş wê hûn bigirtina...

- Ez jî bawer dikim...

- Ew gundiyên ku di pêşiya me re derbas bûn kî bûn, ji bo çi dibeziyan, ji bo çi tifing di destên wan de bûn?...

- Ew diçûn neçîra kewan....

- Me jî xwe bi xwe re digot ku tê ne peşiya me. Ji bo ku me bigirin radestî dewletê bikin...

Edî, wextê em ji êfendî cuda bibin hatibû... Me, bêhnekê xwe ker û lal kir. Dinya jî ji me re ker û lal bû... Ji me her sêyan bêhnekê qet deng derneket... Bilind, ev bêdengî xira kir. Bê dil xira kir... Ji ber ku me nedixwest , ne ji xelkê xwe, ne ji welatê xwe, ne jî ji Efendî cuda bibin:

- Edî, em xatirê xwe ji hev bixwazin...

Em rabûn ser piyan. Em her sê jî kelûgirî bûn. Bi wî awayî me hev hembêz kir. Efendî gote me:

- Ez ê, heta bin rêya qîr li cem we bihatama lê, her kes li vê derê min nasdike, mirovên ku şeytaniyê bikin, li wê derê pir in. Heya çend rojan xwe di kuna hirçê de veşêrin, eger dinya aram bû. Biçin wê mala ku mirovên Bilind lê...

*****

Ji cihê ku me, ji Efendî xatir xwest, heya kuna hirçê, em çawa meşiyan ez nizanim. Ew rê ji bo me bû bêhnek... Em bê bela gîhiştin kuna hirçê. Lê ji bo me, ketin û derketina kuna hirçê bi bela bû, bi taybet jî bo Bilind...

Aliyên şkeftê û ber şkeftê ji ber aşûtê wek betonê lêhatibûn. Me bi darekî ku aliyekî wî tûj şûna lingên xwe çêkir. Bi wî awayî em ketin şkeftê... Eger ku li ber şkeftê lingên me bişemitiya em ê jî bişemitîbûna...

Destpêkê Bilind ket kuna hirçê. Lê bi zorê ketê... Ji ber ku Bilind zexm bû, kincên wî bi kevirên derdora deriyê kuna hirçê, kevirên wek kêran ên tûj ketin, diriyan ...

Ji bo ku ez jar bûm, bi hêsanî ketim kuna hirçê.

Kuna hirçê germ bû. Kêm hewa distand.

Di kuna hirçê de du mişk jî hebûn. Lê, ewqas jar bûn ku bê hêz bûn. Nedikarîn gezekê jî li nan û pêxwarina me bidin... Bi zorê digeriyan. Car caran dihatin ser bedena me, ji me jî nedireviyan, xerîb û dost bûn...

Ez û Bilind me hevdu re neaxivîn, ji bilî carekê, di wê axaftinê de jî Bilind di derheqê bira û jinbira xwe de agahî dan min:

- Li wî gundê ku dabûn dû me, wexta ku tu di mezel de rûniştîbû, ez û kirîvên xwe li derve diaxivîn. Kirîvên min, ji min re gotin:

- Her roj leşker têne gundê we, êşkencê li birayê te dikin. Tiştên bêrêz li wî dikin... Dîsa jî birayê min ê mezin di wê rewşê de ji bo me xeber şandiyê ku me, nêzî Behraspî derbasî Sûrî bike... Jinbira min jî hemû zêrên xwe ji bo me

şandine. Ji bo ku em pê derbasî Binxetê bibin...

*****

Em, sê rojan di kuna hirçê de man. Me, piştî sê rojan ser danê êvarê xwe berda gundê mirovên Bilind. Me, xwe wek bayê kur berda gundê xizmên Bilind ê ku li deştê... Em, berbanga sibê gîhiştin çoltera gundê mirovên Bilind...

Di meşê de, di pişta me re xwêdanê avet. Ji ber xwêdana pişta me, sakoyên me gewr bûn. Bilind:

- Rengê sakoyê te hatiye guhertin...

- Sakoyê te jî wek sakoyê min lêhatîye...

Beriya ku roj hile; em çûn çar pênç malan. Ji bo ku em ji xwe re hin nan û pêxwarin wergirin. Lê, her pênc malan jî derî li me venekirin. Em heta êvarî birçî man.

Ji neçarî heya êvarî me, xwe di bin pirekê de veşart.

Me, pişta xwe da hevdu. Me, destê xwe jî li ser çokên xwe girêdan. Ji bo ku em neqefilin... Bi wî awayî heya êvarî em, di bin pira beton de man. Em ji ber sermayê dilerizîn. Şîq şîqa diranên me bû, ji ber sermayê...

Di qemika êvarê de bi awayekî melisandî, em çûn mala xizmên Bilind.

Bilind li derî da. Di mal de zilamekî got :

- Ew kî ye?...

- Ez im Hesen, ez Bilind im...

Hesen deriyê hewşa malê vekir. Bi qandî ku em guh lê bin, bi hêdîka:

- Herin paş xanî...

Em çûn paş xanî... Paş xaniyê Hesen vala bû. Tu xaniyên din li paş xaniyê Hesen tune bûn. Hesen, hat serbanê xaniyê xwe, destê xwe li me ba kir. Bi destê xwe gote me:

- Hûn jî werin vir ... Em jî çûn ser ban, cem Hesen... Me, xwe di kuna kadînê de, berda kadînê...

- Li min biborînin. Jina cîranê me, li mala me bû. Ji ber vê yekê min, hûn di kuna kadînê re derbas kirin. Got û em, bi hemû heza xwe hembêz kirin... Hesen, em bi hemû heza xwe ewqasî hembêz kirin ku bû, qirç qirça parsûyên pişta min... Min, xwe bi xwe re got qey, parsûyên min şkestin...

Hesen, li jina xwe heytan:

- Keçê, zû bi lez doşek û balîfan bîne. Piştre jî bi lez û bez çayê hazir bike.

Jina Hesen, doşek û balîf anîn. Li mezelê ku maxa tûtinê lê, em rûniştin. Di axurê xaniyê Hesen de. Di axur de sê mezel hebûn; yek ê sewalan, yek ê alif û yek ê tûtinê ...

Jina Hesen, wexta ku çay anî xêrhatina me kir.

Me her duyan jî mal avayiya wê kir, hal û xatirê wê pirsî... Hesen berê xwe da jina xwe, bi me re axivî:

- Wexta ku heval nû dihatin cem min, ji bo ceribandina hevalan, min ji jina xwe re digot, nêzikî wan bibe, hele exlaqê wan çawa ne em bizabin...

Jina min jî, piştî ceribandina hevalên we, gote min:

- Wan hemûyan şîrê helal vexwariye. Hemû jî wek aveke zelal in... Ma qey heval Bilind, ez neheq bûm, ji ceribandina hevalan?...

- Hesen, tu ji erdê heya ezmanan bi heq e. Heqê te heye...

- Bav û kalên me digotin:

- Namûs avêtine ber sayan, sayan ne bêhn kirîye, ne jî xwariye...

Em, du rojan li mala Hesen man. Ji her cureyekî xwarin û vexwarin, jina Hesen danî ber me, ser sifreyê...

Hesen yekî peredîn bû. Rojekê ji bo ku bavê wî jê re gotiye: "Înşalah Xwedê canê te bistîne." ji ber vê gotina bavê xwe hers bûye. Çar kêr li singa xwe daye...Ji ber vê yekê her singa xwe nîşanî me dida, digote me:

- Li ser gotina bavê xwe min, çar kêr li singa xwe dan. Lê Xwedê canê min, nestand. Min kêra destpêkê li dilê xwe da, lê bi şaşîtî min mîlîmek li jêr dilê xwe dabû...

Karê Hesen, her roj bi meqesê tûtin hûr kirinbû. Ez jî li kêleka wî rûdinîştim. Min cixare dipêçandin. Ji tûtina riş, rengê wek zêrên zer. Min her cixare dipêça. Li pêşiya min bêndereke biçûk, ji cixaran çêdibû. Tûtina Hesen ji tûtina pîleya yekem bû. Pir giranbiha bû...

Saetên me hebûn. Lê hewcedariya me bi saetan tunebû... Wexta ku dîkil dixwend me, dizanî bû ku berbanga sibehê ye. Wexta ku kerê Hesen dizirî, me dizanî bû ku wexta alif dayîna sewalan e. Hesen jî hişyar e, alif dide sewalan û Hesen bêhneke din wê bê cem me.....

Li mala Hesen, ez û Bilind me, kêm bi hevdu re galegal dikir. Rojekê em her sê li cem hev rûniştîbûn. Hesen, bi hedîka got:

- Ez ê we derbasî Binxetê bikim. Dostekî min nêzikî ser sînor heye. Sînor bihost bihost nas dike. Em biçin cem wî, bila we derbasî Sûriyê bike...

- Heval Hesen:

- Birayê min ê mezin jî ji bo me xeber şandibû. Ji bo ku me, nêzî Behraspî derbasî Sûrî bike... Ji vir, heya wê derê pir dûr e, di cihê ku tu dibêjê re em derbas bibin çêtir e.

- Ez jî wek we dihizirim. Bilind, ew cihê ku birayê te yê mezin gotiye, pir dûr e û bi xeter e...

- Jinbira min jî ji bo me xeber şandibû. Zêrên xwe jî hemû ji bo me rê kiribûn. Ji bo ku em di cihekî nêzik re derbasî Binxetê bibin...

- Cihê ku birayê te yê mezin gotiye ne pêkan e ku hûn di wê derê re sax salîm derbas bibin. Cihê ku jinbira te û ez dibêjim hîn baştir e, ji bo we...

- Her roj leşkerên dagirker tên gundên we, li birayê te yê mezin êşkence dikin. Li serê hecetê wî benekî girêdidin. Şilf û tazî dikin, bi wî awayî di nava gund de digerînin. Çend caran birayê te yê mezin xwestiye ku xwe bikuje, jinbira te pê hesiyaye nehiştiye ku xwe bikuje...

- Bila, ji malbata me kes nizanibe ku em li cem te ne...

- Tu xeman nexwe, pênahesin Bilind...

Em, du roj û sê şevan, li mala Hesen man. Lê, şeva sisêyan Hesen jî li gel me, ji kevaniya Hesen me xatirê xwe xwest:

- Em ê biçin gundekî dîtir. Bila heval li wê derê bimînin...

*****

Me ji gundê Hesen berê xwe da ser sînor... Me, çemê Firatê, bi keleka masîgirekî derbas kir. Keleka masîgir bi destan hatibû çêkirin.

Cihê ku em di çemê Firatê re derbas bûn, ava firatê hêdî hêdî bi aram diherîkî. Wexta ku ba dihat çend dilop av li dest û rûyên me diketin.

Me, Firat bi hêsanî derbas kir. Me, ji kelekvan re got: “Em tûtinfiroş in. Em ê biçin ser sînor, hin mirov deyndarên me ne. Em ê ji wan deynên xwe wergirin.

Ji xwe Hesen kelekvan nasdikir. Lê belê, me ji rûyên wî dixwend ku kelekvan ji me bawer nekiriye ku em tûtinfiroş in...

Nîvro, me li gundekî deştê firavîn xwar. Me, li wî gundî bêhna xwe jî veda...Kevaniya malê bi lez û bez germiyek ji me re çêkir. Me, bi ser germiyê de jî çay vexwar..

Bi nîvro, mala ku em lê mêvan bûn. Êzingên wan tune bûn. Bi sergînan sobe pêxistin. Ez bawer dikim ku gundê me lê firavîn xwaribû li kêm malan êzing hebin. Ji ber ku li derdora gund kelem jî tune bûn...

Em, bê bela gîhiştin ser sînor. Lê, di cihekî de em, di pêşiya qereqolekê re, bi taksiyê derbas dibûn, leşkerekî li plaqeya taksiya me dûr û dirêj nêrî, nêrî...

Wexta ku leşker li plaqeya taksiya me nêrî, Bilind gote min:

- Bila çardehxura te hazir be; gule jî di berde be...

- Xeman nexwe, hazir e...

Em ji qereqolê dûr ketin. Hîna jî leşker li plaqeya taksiya me dinêrî.

Em, li ser danê êvarê gîhiştin gundê dostê Hesen...

Hesen gote me:

- Hûn di nav pembûyan de xwe veşêrin; ez ê biçim gund, eger leşker li gund tunebin, ez ê werim we jî bibim gund...

Çûyîn û hatina Hesen a gund bû yek... Hesen, li gel xwe bi zilamekî li ser xwe, bejna wî dirêj û zexm vegeriya. Hate cem me...

- Silav ji ve re, bextê we lêda...

- Ser çavan, ji bo çi bextê me leda...

Heval Zirav, dostê min, ev xweşmêrê ku li gel min e. Navê wî Nebo ye. Pênc heval jî li gund in. Sibe bi şev Nebo wê we derbasî Binxetê bike. Êdî, hûn jî destûra min bidin ez vegerim...

Me got:

- Destûr a te ye.

Me hev hembêz kir...

- Silavên me jî li heval û hogiran bike...

- Ser seran, ser çavan...

- Bi taybet, silavên min li Çiyayê Nemrûdê bike. Nebû nesîb ku ez Çiyayê Nemrûdê bibînim. Lê, careke din ku lingên min bi Semsûrê ket, ji her heftê rojekê ez ê Nemrûdê ziyaret bikim. Wek ziyaretgehekê...

- Ser seran, ser çavan. Heval Zirav.

- Heval Hesen, van zêrên jinbira min jî bibe, bidê. Êdî, pêwîstiya me, bi zêran nema. Pir silavên min jî li hemû malbata me bike...

- Baş e, heval Bilind...

- Em biçin gund, heya berbangê li gund bimînin.Siberoj bila hevalên keç, li gund bimînin, hûn her pênç hevalên xort jî, stargeheke min heye; Nêzî sînor, bi roj li we derê bimînin...

- Baş e, heval Nebo...

Em, li gel Nebo çûn gund. Me, şîva xwe, wextê paşîvê xwar. Me xwarinên sivik xwarin, wek xwarinên ku di taştê de tên xwarin: penîr, zeytûn, mast...

Li mala ku em, lê mêvan, me jin û keç nedîtin. Kar û bar me zilaman kir. Lê, li mezelê kêleka me dengên jin û keçan dihat guhê me. Lê, ji jin û keçan kesî xêrhatina me nekir...

Carekê Nebo, bi malxwê malê û kesek ku navê wî Ramo bû re got:

- Hûn derkevin derve, em ê hin tiştan biaxivin...

Malxwê malê bi dil derket derve. Lê belê, zilamê ku navê wî Ramo bû mirûzê xwe tirş kir, bi mirûzekî derket derve... Hîngê Nebo dest biaxaftinê kir:

- Hevalno, sibe bi şev, em ê sînor derbas bikin. Li ber cihê ku leşker lê nobetê digirin, rêya wesayîtan heye. Wek rêya qîr li wê rêyê hatiye. Dewletê jî ew rê xîz kiriye. Ji ber vê yekê, ew rê wek rêya qîr lêhatiye. Pêwîst e deng ji lingên me dernekeve...

Li ser sînor jî heya ku em derbasbin axaftin qedexe ye...

Çekên du hevalan hene. Jixwe çeka min jî heye. Çardehxureke hevalekî jî heye...

Her du hevalên ku klêşên wan heyî, wê milê rastê biparezin; ez ê jî milê çepê biparezim...

Qanûna derbasbûna sînor ev e. Eger ku kê destpêkê gule teqandin, kê li kê gule reşandin, ew alî bi ser dikeve... Ango eger, leşker bi me hesiyan, eger wan beriya me, gule li me reşandin, ew bi serdikevin. Em jî paş de dizivirin...

Eger ku me, beriya wan gule berdan wan, em ê biserkevin û sînor biborin...

Eger ku me, nikarîbû sînor biborin, em ê li cem stargeha ku hevalên xort wê rojekê têde bimînin, em ê hev bibînin. Navê parola me jî nirç nirç e..

Ez nexwazim Ramo jî li gel me were... Ji ber ku ez wî ziqimî baş dinasim. Ji keroşkekê bê ziravtir e. Wê li ser serê me, bibe bela... Lê belê, hevalan ji min re got: " Ji bo ku li ser serê me nebe bela ji wir bila biçe Binxetê, çêtir e...

Carekê polês ev Ramo girtibûn. Li xwe mukir hatibû, destpêkê navê jina xwe dabû polêsan...

Me, Nebo bi baldarî guhdarî kir. Piştî ku axaftina Nebo xilas bû. Me, bi dorê nobet girt.

Berbanga sibê, em ji gund derketin. Em heya stargeha Nebo çûn. Stargeh li nav zeviyên pembû debû. Mewê pembû hemû di nîvî re hatibûn birîn. Min, ev ji Nebo pirsî:

- Heval Nebo, çima serê mewê pembû hemû ketinê erdê, wek hatine birîn?...

- Wexta ku ba tê mewên pembû dihejin leşkerên dijmin dibêjin qey apoyî, di nav pembû de xwe veşartine. Ji ber vê yekê guleyan berdidin pembû. Guleyan li pembû direşînin. Ji ber vê yekê wisa li pembû hatiye...

Em gîhiştin ber stargeha Nebo. Nebo deriyê stargehê vekir, Berê xwe da me:

- Eger, pêdiviyên we hebin bibînin, destnimêja xwe durust bikin. Piştî ku hûn ketin stargehê, ez ê deriyê stargehê, li ser we bigirim. Heya ser danê êvarê jî derketina we qedexe ye, ji stargehê....

- Xeman nexwe, heval Neboo...

- Baş e, Heval Bilind...Parolaya me jî nirç nirç e...ez ê di qemika êvarê de werim, li ser stargehê bikim nirç nirç...

Em, ketin stargehê. Stargeh ji bo yek kesî hatibû amade kirin. Nebo stargeh, tenê ji bo xwe amade kiribû. Lê em, têde pênc kes bi cih bûn. Bilind, di stargehê de rûnişt. Lingên wî gîhiştin dawiya stargehê... Em du, li kêleka Bilind a rastê; du jî li kêleka bilind a çepê rûnîştin. Me, lingên xwe di ser lingên Bilind re dirêj kirin. Me, çokên xwe jî xistin zikê xwe. Me, destên xwe jî li ser çokên xwe girêdan. Heya êvarî, em bi vî awayî di stargehê de sekinîn...

Di qemika êvare de li ser devê stargehê dengê nirç nirçê hate guhên me. Me zanîbû ku ew dengê Nebo ye...

Nebo, deriyê stargehê vekir. Ji bo ku dest û çokên me tevizîbûn; Nebo yek û yek bi destên me girt, em ji stargehê derxistin. Wexta ku çokên me hatin ber me, rast bûn, tewza bedena me xwe berda. Ji me her yek bi hêlekê ve bazdan... Ji bo ku em, destnimêja xwe durust bikin...

Nebo, ket pêşiya me, heya cihê ku hevalên me yên keç û Ramo li benda me bûn ...

Di qemika êvarê de me, berê xwe da sînor...Nebo di pêşiya me de; hevalak ku bi klêş li dû wî de, hevalên bê çek jî hin li dû hevalê ku bi klêş de, hevalên keç jî li dû wan de; Bilind, li dû hevalên keç de...

Nebo bi dengekî bilind û bi hêrs:

- Ramo, tu têkeve dû Bilind!...

- Ez yekcar nekevim paş Bilind. Ez ê li dawî bimeşim...

Li hemberî helwesta Ramo bû, nirç nirça Nebo... Nebo, wek bêje, kê ew bela tevlî me kir û dîsa kire nirç e nirç...

Ez, li pêşiya hevalekî bi klêş, Ramo jî li dawiya me, cihê xwe girt...

Ramo, her dehpanzdeh metre dûrî me dimeşiya. Li cihê ku Ramo dimeşiya req reqa dengê pêlavên Ramo digîhişt ezmanan...

Her ku dengê pêlavên Ramo dihat, Nebo digot:

- Ew ê bê zirav, kê kiriye mîlîsê hevalan?...

Ew ji keroşkekê jî bê ziravtir e...

Ramo, binê pêlava xwe bi bizmarê hespan bizmar kirîbû. Em, bi vî awayî gîhiştin ber têla sînor, têla rêsayî..

Li ber têlê, leşkerek bi me hesiya. Bi Tirkî got:

- Kim o? Seni öldürürüm dur! Leşker ku gotinên xwe xilas kirin guleyek, berda hewayê...

Nebo, çû ser kozika leşker, jarjorek vala wî kir... Piştre têla ber sînor rakir, gote me:

- Di coya avê re bazdin, ji coyê tu caran dernekevin. Eger, hûn ji çoye derkevin; hûn ê pêl mayînan bikin...

Em nêzikî nîv saete, di coya avê ya xwezayî re bazdan. Em, gîhiştin cihekî talde... Nebo, gote me:

- Cixarê bikêşin...

Me, bêhna xwe veda. Nebo, dest bi serpêhatiyên xwe kirin:

- Leşkeran careke ez girtim. Ez ser serî, bi lingê rastê ve daliqandim. Ez, li xwe mukir hatim. Paşê ez derxistim pêşberî dadê, dadger ji min pirsî:

- Bi rastî tu mîlîsê Apoyiyan e?.. Bi rastî, tu wan derbasî Binxetê dikî?...

- Rêzdar Dadger. Ez, nod kilo me... Ez, bi lingekî ser serî daliqandim, min jî ew tiştên derew gotin...

Piştî îfadeya min; dadger têr keniya û ez serbest berdam...

Cihê ku me bêhn vedida; ez û Bilind, li kêleka hevdu rûniştibûn. Bilind berê xwe da min:

- Ez ê, êdî navê xwe bikim Hesen...

- Li ser xêrê be. Ez, navê xwe naguherim. Lê belê, eger ku lingên min careke din li bajarê te ket, ji her heftê rojeke, ez ê Çiyayê Nemrûdê ziyaret bikim....

*****